


## Rewşa ruhî û korona

Şewba koronayê, li gelek welatan jiyana rojane di hefteyekê de serobin kir. Divê bê bibîrxistin ku ev yek ji bo her mirovî, bi taybetî jî ji bo kesên xwedî nexweşiyên derûnî rewşeke xetere ye. Pênaseya "betlaneya koronayê" pênaseyeke şaş e... *Dr. Abdullah Polat / R.7*



## Li benda rihma koronayê

Zanyarên derûnnasiyê dibêjin: Di van rojên koronayê de, di hundirê malê de be jî têkiliyên xwe ji kesî nebirin, xwe ji heval û hogirên xwe dûr nekin, li wan bigerin, bila bêhna we derkeve. Eyşan, çawa vê şîretê ji televîzyonê bihîst, rakir telefonê... *Berfîn Dijle / R.10*



## Bindarûk

Kafka di rojnivîska xwe de nivîsiye ku jiyan, wekî xewnekê ye. "Lê" dibêje Guattari û benik di guhê me re dike di nivîsara xwe de, "ev nayê wê wateyê ku Kafka bi misînê vala çûye destmêjê, bi gotineke din xwe berî nav xewn û xeyalan daye... *Şener Ozmen / R.11*


Rojnameya Heftane

# xwebûn

www.xwebun.org

27 Nîsan - 3 Gulan 2020

Hejmar: 19

Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org


## Dê demeke dirêj ev vîrus li gel me bimîne!

Vîrusa koronayê (Covid-19) tevahiya cîhanê xistiye bin bandora xwe. Li her welatî geşedan, tedbîr û dane diguherin. Her saeta ku derbas dibe ji bo civakê dibe sedema mezinbûna tirs û fikaran. Li aliyekî bîlanço giran dibe, li aliyê din tedbîrên curbicur tên girtin û her wiha li dijî vîrusê lêkolînên ji bo parzayê (aşî) hene. Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê, li hemberî biryarên sistkirina tedbîran raya giştî hişyar kir û got: "Xwe nexapînin. Hêj rêyek dûr û dirêj li pêşiya me heye ku derbas bikin. Dê demek dirêj ev vîrus li gel me bimîne." Li gorî daneyên dawî jî li tevahiya cîhanê 3 milyon kes bi vîrûsê ketine û zêdetirî 200 hezar kes mirin... *RÛPEL - 7*



## Sêgoşeya stratejîk

Dewleta tirk dixwaze 'Sêgoşeya Stratejîk; Efrîn-Qendî-Şengalê', ango Rojhilata Navîn bi temamî dagir bike. Çimkî ev sêgoşe ji aliyekî ve ji bo NATO-Ewropayê, ji aliyê din ve ji bo hevpeymana Avrasya-Şanghayê gelek girîng e. Ev êrîş li hemberî hemû hêzên kurdan e. Divê hêzên kurdî û gelên Kurdistanê li dijî vê êrîşa berfireh hişyar bin. Li dijî vê çareseriya tekane jî yekitiya neteweyî ye... *Mem Avba / R.3*

# Li onlineyê xemxurên kurdî

Ji ber şewba vîrusa koronayê civak li malê asê maye û ev yek rê li ber lêgerînên nû vedike. Komek mamosteyan Zanîngeha Kurdî ya Online ava kir û ders didin 320 xwendevanan. Yek ji mamosteyên zanîngehê Doçent Îbrahîm Seydo Aydogan, ji rojnameya me re axivî û wiha got: "Ji ber xemxuriya xwe ya zimanê kurdî me xwest ku van zanînên xwe bi gelê xwe re parve bikin. Tevî ku rojê 6-7 saetan em bi vî karî dadikevin em gelekî kêfxweş in û em nawestin ji ber tu kar wekî karê tu ji bo xizmeta gelê xwe dikî nikare vê kêfxweşiyê bide...

*Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / RÛPEL - 4*



## Welatê Antîakos ê zîrek: Komagene...

*Agît Yazar / RÛPEL - 12*

## Dengê lingê bi Heybet...

Heybet jineke ji Gîlanê, qebîleya Derekî ya koçer e. Ev qebîle bihar û havînan li gundê Kelaç Xanî, li başûrê Dîlmanê, payîzan jî li gundê Niyawelderê Xawer ê Dîlmanê û zivistanan jî li gundê Çoşilder ê 5 kîlometere dûrî Sîyahkûlê diman. Ew di çaxekê de jiya ku gelek zilam ji navê hikûmetê jî bi xof dibûn, lê wê tifing rakir û ji bo şoreş û têkoşînê tevî zilaman beşdarî tevgera "Cengelî" a Mîrza Koçek Xan bû... *Zehra Mohammedzadeh / R.2*



## Antolojîyeke kêmnas

Antolojiya ku ez van rojan dixwînim û ji helbestên tê de bêhna "nêrgiz"an dikim: Antolojiya Helbesta Nû Ya Kurmancên Başûr e ku Xelîl Duhokî amade kiriye. Ev antolojî, cara pêşîn weke sê cildan çap bûye... *Ferec Koyistanî / R.11*

## Ciwîyayîş, emeg û mekan

Metropolî, sûke ke mordem tey xenekîno roza ma yê ewroyîni de jê cayê şaristanîye, jê cayê însonê modern yenê misnayene. Raştîya metropolanê pîlan, sûkanê pîlan zovînaya. Ya kî însone modern çi turî yo? Mana "modern bîyayene" çik a? Ya kî çekûya "mordern" çik a? Nê pêro persî… Hama ma ser ciwîyayîş, emeg û mekanî de vinderîme. Ciwîyayîş û emeg têwerte de rê. Emeg û ci rê wayîr vejiyayene zaf muhîm a... *Meral Ozel / RÛPEL - 9*

## Evdalê Zeynikê, yuzbaşî û kolera

Di dawiya salên 1800'î de nexweşiya kolerayê xelkên derdorê qir kiribûn, taqet di tu kesî de tunebû ku li hemberî Romê serî rake. Evdalê Zeynikê jî di van salan de kor dibe, xizan dikeve û bi destê Temoyê lawê xwe digire û gund bi gund digere. Di wan salan de yuzbaşiyê îngilîz Captain Fred Burnaby tê Kurdistanê... *Sedat Ulugana / R.8*



## Çîroka Nazmî

Ew bi xwe qet najîn û bi ser de radibin hevokên qirase rêz dikin wek morîkên gerdeniya diya xwe. Naêşin û behsa êşê dikin, kêfê nizanin lê behsa kêfê dikin. Ev însanên najîn û li ser jiyanê difikirin û li ser wateya jiyanê hevokan saz dikin, hingî dikevin etra gotinên xwe yên li ser jiyanê ka dê çi bêjin ji bîr dikin ku bijîn. Kenê min bi wan tê. Bîra Nazmî gelkî ko bû, tiştan zû ji bîr dikir... *Dîyarî Asûr / R. 5*

# Xurcika çandê cur bi cur e

Adar Şaman

Çand, jiyana azad e. Ziman e, ruh û bedena gelan e. Hebûn e, gotin û parastina civakê ye. Zîhniyet û raman e. Bîr e, rûmet û nasname ye. Çand, têgehek kûr, dûr û hûr e. Dest û lepên çandê dirêj e. Diherike û bêrawestan e. Çand mîna şaxên lavlavkê, xwe li tevahiya şaneyên civakê rêsaye. Di qelîştokên axê de ava çemek e! Xurcika çandê cur bi cur e.

Çand, ji çandiniyê tê û bi civakbûyînê dest pê dike. Çanda civaka xwezayî di dendika tovê genim de bi teşe dibe. Şoreşa neolîtîkê berhema çanda aştî, wekhevî, ekolojî û civaka demokratîk e. Hêza xwenasînê ye. Civak, çand e. Mirov bi çanda xwe tê naskirin. Çand, ji jiyana rojane dest pê dike. Cil e, berg e, aşxane ye û têkiliyên civakî ne. Çand, parvekirin e. Her yekê ji van bi serê xwe mijarên çandê ne. Lê em ê tenê li ser çend mînakan bisekinin.

> Civak, çand e. Mirov bi çanda xwe tê naskirin. Çand, ji jiyana rojane dest pê dike. Cil e, berg e, aşxane ye û têkiliyên civakî ne. Çand, parvekirin e. Hêza xwenasînê ye

Mixabin ew çanda kurdî ya ku di dîrokê de malovanî ji mirovahiyê re kir, bi tunebûnê re rû bi rû ye. Hêdî hêdî çanda me tune dibe û dergûş bê kes û kûs dibe. Çemê boş, kêmmasî dibe. Mînakên gelekî bi êş hene! Çend ji wan mînakan jî ev in:

Berê li gundan çanda zêwan hebû. Zêw dihatin dayîn. Zêw, weke kevneşopiya bi hezar salan di 15'ê tebaxê de, dema bayê nû werdigeriya, li serbanan an jî li meydanên gundan dihatin danîn. Wateya zêwê; êdî demsala havînê bi dawî dibû, xatir dixwest û diket meha payîzê. Hewa hênik dibû, baran dibarî, terbîs diket, ax şil dibû û çotyar diçûn cot. Bi hatina bayê nû re xweza jî diket şekil û şemalek cihê. Pelên daran zer dibûn û diweşiyan. Xweza çîptazî dima.

Li gorî pêşiyên me, ji nifşê biçûk re digotin "Çanda zêwê xwe dispêre dîrokeke gelekî qedîm û antîk." Berî hefteyekê amadekariyên wê dihatin kirin û bi tevlîbûna tevahiya gundiyan pêk dihat. Her malê bi qasî derfetên heyî, êdî çi ji kê bihata, hinka elok, hinka qaz û hinekan jî pez ji bo zêwê serjê dikirin. Xwarin çedikirin û danîn cihê zêwê. Xwarin li ser sifrê dihat rêzkirin. Zarokên gund, tevî kevçiyên xwe ji malê dihatin û li ser sifrê rêz dibûn. Beriya dest bi xwarinê bikirana, ji rûsipiyê gund kesekî digot "Xwedê! Tu nexweşî, qeda-bela, şer, xela û xizaniyê bi ser me de neynî." Zarokan, tev bi hev re digotin "amîn" û bi gotina "noşîcan be" dest bi xwarinê dikirin. Li ser sifra zêwê tenê zarok kom dibûn û zêw ji bo wan dihat danîn. Her taxê zêwa xwe cuda datanî. Zêw, ji hêla meclisa rûsipiyên gund ve dihatin rêxistinkirin. Çi zarokên keçik, çi jî yên kurik, bêyî ku ferq û cudahiyê bixin nav wan bi hev re li ser sifra zêwê rûdiniştin. Xwarina ji ber zêwê dima jî didan malbatên feqîr.

Dîsa, berê li gundan di demsala payîzê de çanda danûyan hebû. Genim dikelandin û dibûn danû. Ev ji bo zarokan jî şahî û ziyafet bû. Zarokan; xwe ji vê ziyafetê jî, bê par nedihişt. Lalîk û kevçiyê xwe digirtin û diçûn ser beroşa danûya! Her malbatê ji bo bikin savar, genim dikelandin û dikirin danû. Danû, di kelegerma havînê de li ber tavê zuha û hişk dibû. Di cotmehê de jî dixistin cirnan; di coniyan hûr dikirin, moxil dikirin, didan ber bayê û dikirin savar. Dema savarhêrê, şevên destarhêrkê li dardixistin. Gundî, kom bi kom li der û dora destar kom dibûn û bi dorê destar digerandin. Her destarek, sê jinan digerand . Destar, aşên wê demê bûn. Yên destar digerandin jî jin bûn. Di dîrokê de, ya cara ewil genim kedî kir, simbilê ewil berhev kir, destar gerand jin bû. Ya ku cara yekemîn tenûr kişif kir, çêkir û nan bi tenûrê veda jî jin bi xwe bû. Xwarina destarhêrkan jî şorba savar bû. Êvarê, di ber destar de rûdiniştin, heyanî berbanga sibehê destar digerandin; stran, çîrok û mamikên wan jî di ber re kêm nedibûn. Amadekariya zivistanê bi savarhêrê dest pê dikir.

Çanda Zibarê jî yek ji van bû. Ya roj û demên teng bû. Zibare ji kedek hevpar pêk dihat û gundî diçûn hewara hev. Mezinên gund bi hev dişêwirîn û bi dorê diçûn alîkariya hev dikirin. Xelkê gundan palehiya nîsk, ceh, genim, nok û kizina bi zibarê didirûtin. Di nav xwe de zibare dikirin û her carê diçûn alîkariya malekê dikirin. Ji bo avakirina xaniyan jî zibare hebûn.

Mixabin di van çend salên borî de yek ji van mînakên me li jorê behsa wan kir êdî nînin û ji holê rabûne. Yan jî tev hatine jibîrkirin. Gund vala bûne, bêkes û wêrankirî ne. Lewma, li şûna ev kevneşopî werin parastin, ji çand û cewhera xwe tê dûrketin. Nirx li ser çandê bi gewde dibe. Lê nirxên me her roj tên dizîn, talankirin û dagirkirin. Çand, ziman û hebûna gelê kurd ne azad e; di bin metingeriyê de tê bişaftin! "Çanda rêzefîlman" êdî bûye parçeyekî jiyana mirovan! Rêzefîlm, dibin sebebê çanda tûndiyê. Ev, yek ji rêbazên çîna serdest e. Ew ji bo bingeha armanca xwe reklam, rêzefîlm û nûçeyên bi derewan hatine xemilandin weke amûr bi kar tînin.

Gelê kurd ji zimanê şoreşa çanda neolîtîk re, nasnameya civaka azad re, bîr û baweriya yekemîn re DAYIKTÎ kir. Çand bi hebûnê, hebûn bi çandê azad e. Mirovatî hebûnek çandî ye. Em li çand, rûmet nasname, zimanê xwe xwedî derkevin û nirxên xwe biparêzin. Em ji çanda xwe hez dikin, ji ber ku em bi çanda xwe hene. Ji bo ku raman mezin û mayînde bibe, divê çand azad be.



## Li Gîlanê dengê lingê bi Heybet...

Zehra Mohammedzadeh

Îro ji hemû rojan cihê bû. Li Gîlanê roj ji mêj de li pişt çiyayan hatibû ava, deşt û çiyayên Siyahkûl û Dîlemanê bi gulên rengareng hatibûn xemilîn. Tevgerek bêhed û hesab hebû; jin û mêr, zarok û kal, hema bêje wê rojê herkes li kolanan bû. Jinan bi cil û bergên xwe yên rengîn, li wan deveran dihatin û diçûn. Lê di nav wan de yek hebû ku pir bi 'Heybet' bû! Jineke bi tevger, nêrîn û meşa xwe, bala herkesê li ser bû ka wê çi bibêje! Ji tevgera wê jinê, mezin biçûk herkesekê dizanî tiştinan qewimiye…

Salên dûr û dirêj bûn. Welat di nav rewşeke xirab de bû. Nexasim Gîlan ku gelê wê li dijî zilm û zorê bi hêrs bûbû… Hema bêje pêvajoya salên dawî ya hikumraniya Şahê qaçar û destpêka serdema Pehlewî bû. Jixwe li herêma Siyahkûl ku dem dema axa û erbaban bû, ji aliyê din ve jî pergala feodal lê serwer bû, wê Heyder Xan pergala bacgirtinê ne pejirandiba û li dijî zilmê serî rabikira. Ji bo wê jî hikûmetê ew wek dijmin û pirsgirêk li pêşiya xwe didît. Wan serî radikir û dixwestin serbixwe bin. Tu milkê wan nîn bû, gundî ji aliyê wan ve dihatin pejirandin û tu mafê xwedaniyê nedida erbabên xwe. A rast li dijî hikûmetê serî radikirin. Wan di karûbarên gelemperî ên gel ku girêdayî wan bûn de, mudaxele dikirin. Di pirsgirêkên eşîrê û malbatî, pirsgirêkên civakî ên ji ber erd û zevî û hwd. biryar didan. Elbet Heyder Mûshil El-Malîk hakimê dewleta Siyahkûl jî ji neditî ve nedihat. Lê destûra jiholêrakirina birêvebirina Heyder Xan di sala 1307'an de tê dayîn û di sala 1308'an de, ji aliyê Tazê Abad û Dûzlat, ji aliyê hêzên dewletê ve tên dorpêçkirin.

Rojên giran bûn, şer mezin bûbû û hakimê Siyahkûl, dîsan Hisên Qolî Xan ku yek ji mezin û erbabên Siyahkûlê ji dewleta Ehmed Şah û hikûmeta Gîlan û Reştê alikariyê dixwazin. Di payîza sala 1307'an de, Behram Elî Xan efserê dewletê tevî hejmarek Qezaq û leşkeran ji bo zêdekirina zextan û girtina Heyder Xan dişîne Sîyahkûlê. Gel tê dorpêçkirin, lê ew nayê girtin. Di sala 1308'an de mala Heyder Xan dorpêç dikin, lê ew li mal nebû. Lê du birazî, Heybet û çend çekdar di malê bûn. Ew di bin guleyan de dimînin, Sefer Xanê biraziyê wî birîndar dibe û Heybet Xanim jî dîl tê girtin.

Heybet jinek ji Gîlanê, qebîleya Derekî a koçer e. Ev qebîle bihar û havînan li gundê Kelaç Xanî, li başûrê Dîlman, payîzan jî li gundê Niyawelderê Xawer a Dîlman û zivistanan jî li gundê Çoşilder a 5 kîlometere dûrî Sîyahkûlê diman. Ew di çaxekê de jiya ku gelek zilam ji navê hikûmetê jî bi xof dibûn, lê wê tifing rakir û ji bo şoreş û têkoşînê tevî zilaman beşdarî tevgera "Cengelî" a Mîrza Koçek Xan bû.

Ji ber bandor û kesayeta vê jina wêrek gelek stran li ser hatin gotin û di gelek stranên foklorî ên gelê xwe cihî de bîranîna wê zindî tê hiştin. Nav û dengê wê hişt ku ev bûyer her di bîra mirovan de bimîne. Heybet jineke wêrek, xweşik, bihêz û dilêr bû. Ji ber wê jî der barê çalakî û serkeftinên wê de gelek tiştên zêde hatine gotin.

Ji bo gelê Gîlanê navê Heyder Xanê ne xerîb e. Ew yek ji şoreşgerên deh salên ewil yên destpêka qerna 14'emîn Xorşîdî li Siyahkûl û Dîlmanê bû. Salên destpêkê yên pir bi coş ên "Cengelî" ku bi kuştina Mîrza Koçek Xan re hat tefandin. Lê, wê di salên pişt re ev yek nehatiba pejirandin û li gelek cihên cuda ên Gîlanê hin raperîn bihatana destpêkirin. Bêguman rola Heybet a di nav tevgera Cengelî de pir ber bi çav bûye û bi taybetî li ser serînetewandina wê ya li dijî desthilatdaran gelek tişt hatine gotin.

Heybet şêre jina ji welatê Siyahkûl li malê nedima, tevî hevser û zilamên malê xwe bi çek dikir û li daristanên Siyahkûl û Dîlmanê şer dikir. Ew neditirsiya, bi hêjayî tevî şeran dibû, li daristanan bi şev û roj dihat û diçû, birêxistin dikir. Dema ji aliyê leşkerên Mûshîl El-Malîk dîl tê girtin, Qezaq û leşkerên hikûmetê Heybetê ji bo hînkirina cihê Heyder Xan, belge û çekên wan dibin û di bin şikenceyên girande wê dikin lêpirsînê. Ew rexmê işkenceyek giran jî napeyive û lêv li ser lêvê ranake. Di şert û mercên herî bi zehmet de tê ragirtin, lê ew li ber xwe dide û teslîm nabe. Giranî û heybeta wê gelek kesan dikişîna qesra Mûshîl El-Malîkê. Nemaze jinên eşraf û xanan ji bo dîtina wê dihatin û ji heybeta wê bandor dibûn, dixwestin hikûmet wê azad bike. Lê çawa pêkan bû ku wê berdin, ji ber ku pê piştrast bûn ku ger wê di dest xwe de dîl bigirin, an jî şikence lê bikin, teqez wê bikarin Heyder Xan neçar bikin ku xwe radest bike. Serî li her rê û rêbazê didin, şikenceyên fizîkî û ruhî dikin, lê dîsan jî nikarin ji wê tiştekî fêr bibin. Di dawiyê de wê di odeyeke tenê û teng de heps dikin û du qezaqan jî datînin ber derî. Heybet şevek ji şevan bi hinceta biçe destavê, ji destê wan direve û diçe gundê Feştalê. Piştî demekê ku li ciheke weşartî dimîne, xwe digihîne çend ji hevalên Heyder Xan û dîsan xwe bi çek dike û tifing di dest de berê xwe dide daristanan.

Piştî demekê ku ji çend cihan alîkarî dixwazin û alîkarî nayêt, berê xwe didin gundê Feştalê û li wir tên girtin. Heybet û Sefayî tînin Siyahkûlê; jixwe wî yekser dikujin û Heybetê jî dibin Lahîcanê. Bi destûra Riza Şah Heybet tê berdan. Lê dema xebera dilgirtina Heyder Xan li Gîlanê belav dibe, Heybet bi dilê şikestî û bi kerb berê xwe dide gundê Çoşil û piştî dardekirina Heyder Xan, di sala 1315'an de, di 29 saliya xwe de kezebreşî dibe û dimire.

**Xweşkanî**



Felemez Ulug

## Pûtîn ji bajarên mezin bêzar e

Wek gelek welatên cîhanê Rûsya jî ji ber vîrusa Covid-19'ê di rojên zor û zehmet re derbas dibe. Der barê vîrusê û tedbîrên tên girtin de rayedarên Rûsyayê li gor welatên din bi hin zahmetiyên cuda re jî rûbirû diminin.

Li ruxmî hemû tedbîran pêşî li belavbûna vîrusê nayê girtin. Li gelek bajar û navçeyan qedexeyên derketina derve hatiye ragihangin. Der barê tedbîrên tên girtin û xebata ku dewlet di vê mijarê de dide dikin de serokdewletê Rûsyayê Vlademîr Pûtîn bengewazî li gel kir. Pûtîn di nirxandinên xwe de bi belavbûna şewba koronayê ve girêdayî hin mijarên ku di rojeva dewletê de ne jî nirxandin.

Pûtîn di despêka axaftina xwe de da diyarkir ku heya niha li 85 herêmên Federasyona Rûsyayê vîrus hatiye tespîtkirin. Ji ber li gelek deveran wek tê xwestin gel bi baldarî tevnagere pêşî li belavbûna vîrusê nayê girtin. Lê di heman nirxandinê de Pûtîn bal kişand ser mezinbûna bajaran û bi vê ve girêdayî ji ber nufûsa zêde krîza tên jiyîn jî wek pirsgirêka bingehîn nirxand.

Dewleta Rûsyayê dixwaze krîza bi vîrusa koronayê daye der ji bo xwe vegerîne avantajekê. Lewma Pûtîn di nirxandina xwe de got ku; "armanca me ya yekem ew e ku em bikaribin hejmara bajarên mezin kêm bikin û berê gel bidin navçe, bakarok û gundan. Ji gelê me li van devaran rehet bijî ji wek dewlet em ê hewil bidin ku li hemû deveran pêdiviyên gel pêşwazî bikin."

Ev nirxandin di nav gel de bi navê kontrolkirina civakê tê nirxandin. Di heman demê de armanca dewletê ew e ku gel teşwîqî herêmên çandinî û lawir lê tên xwedîkirin bike. Bi vê ve girêdayî ji bo gel li van herêman zehmetiyên mîna xwendin, tenduristî, bazirganî û çûnûhatin jî nejî dewlet wê xizmetê bike.

Zarokên gelê li van herêman xwendina xwe ya heya amadeyî temam kirine wê bi alîkariya dewletê biçin zanîngehê. Dîsa ji bo li van herêman asta xwendinê bê bilindkirin wê ji hêla dewletê ve fona teşwîqê bê dayîn.

Belê dewleta Rûsyayê ketiye ferqê ku hejmarek zêde ya li bajaran çawa pergalê dixitimîne. Her wiha ji ber gund û bajarok vala dimînin civak nikare berhemên xwe biafirîne. Dîsa ji ber nufûsa ciwanan hemû berê xwe dide bajaran çanda neteweyî ya debarkirina xwe bi xwe jî wenda dibe. Lewma di van rojên koronayê de rêveberiya Pûtîn dixwaze krîza heye veguherîne avantajê.

Lê li Rûsyayê hin pirsên pir girîng hene ku nahêlin mirov bi awayekî erênî yan jî nahêlin ku mirov ji vê projeya wisa hêja û xweş bawer bike. Ew pirs çi ne?

Bi derketin û belavbûna şewba koronayê re ji bo gel neçe ser kar ango ji mala xwe derneve dewleta Rûsyayê jî wek gelek weletan li hin bajarên rewşa wan nebaş qedexeyên derketina kolanan da despêkirin. Lê bi qedexeyan re girêdayî dewlet di warê aborî de bi gel re nebû ango nabe alîkar. Lewma di serî de li herêma Vladikafkas û Rsatovê li gelek deveran çalakiyên protestokirina dewletê tên lidarxistin.

Dema mirov vê rewşa ku di van rojên teng de tê jiyîn dibîne baweriya mirov li hemberî projeyên Pûtîn dişikê. Ev projeyên hatine aşkerakirin bêguman pir hêja û bi wate ne. Lê ev proje encax ji hêla kesên bi hêza civakê bawer e û di ferqa zanenûna nirxên civakê de ne derbasî jiyanê bên kirin. Ji bo rêveberiya Rûsyayê ya niha mirov dikare vê bêje; ev hinekî zehmet e.

# Sêgoşeya stratejîk

Êrîş li hemberî partî yan jî hêzekê tenê nîne, li hemberî hemû aliyên kurdistanî ne. Divê hêzên kurdî û gelên Kurdistanê li dijî vê êrîşa berfireh hişyar bin. Li dijî vê, çareseriya tekane jî yekitiya neteweyî ye

Mem Avba

Meseleya Zînî Wertê, weke 'plangeriyeke dagirkeriyê' bê pênasekirin jî di nav ziraviyan de ev plangeriyeke kûr û berfirehtir e. Tenê gavek ji plan û projeya dagirkeriyê ya dewleta tirk e.

Tê zanîn ku sedsala borî, împeratoriya osmanî ji aliyê sermayeya cih û û desthilatiya global ve hate belavkirin. Di çarçoveya peymanên hatî kirin de dewleta tirk a li ser kavil û xirbeyên Osmaniyan hatî avakirin, li ser esasê ku nobedarî û kujeriya pergala serdest bike, hat erkdarkirin!

Bi destwerdana Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) ya Rojhilata Navîn a bi şerê Kendavê re dest pê kirî, bû nîşaneya pêvajoyeke nû. Ev dihat wê wateyê ku şerekî nû yê parvekirina cîhanê dest pê dike. Lewre dewleta bi navê Komara Tirkiyeyê ji bo ku xeyala xîlafeta îslamî û împeretoriya osmanî ya nû careke din ket nav lêgerîn û tevgerê.

Lê belê ji bo pêkanîna vê xeyal û armanca xwe divê astengiya li pêşiya xwe Tevgera Azadiya Kurdistanê (qesta me tevgerên azadiyê yên li her çar beşên Kurdistanê ye) tasfiye bikira ku di 'Pergala Nû ya Cîhanê' de bûbûya xwedî rol û angaşt.

**Cendirmeyê pergalê**

Piştî nîveka sedsala 21'emîn, Tevgera Azadiya Kurdistanê ya xwedî daxwaza serxwebûn û bidestxistina çarenûsa xwe ya neteweyî, li her çar beşên welêt pêş ket û ji aliyê gelê kurd ve jî hate rûmetdarkirin. Hem ji ber daxwazên xwe yên rewa, hem jî ji ber fersendên qeyrana pergala navendî rû dayî, bi berdêlên giranbuha jî be, tevgera kurd di demeke kurt de bû xwedî bandorke mezin. Bi pêşengiya Tevgera Azadiya Kurd, li Başûr hikûmeteke Kurdistanê hat avakirin, li Bakur, gelek destkeftî hatin bidestxistin hema bêje ne bi qasî Başûr be jî heta rêjeyekê bû xwedî însiyatîfa xweseriyê. Li Rojava jî mîna Başûrê welêt rêveberiyeke xweser ava kir. Li Rojhilatê welêt jî heta radeyekê rêxistinbûna xwe ya civakî, siyasî, leşkerî hwd ava kir. Ango kurd êdî hêdî hêdî nêzî serxwebûn û azadiya neteweyî dibûn.

Pergala dewletî, ango modernîteya navendî, yan dê hebûna 'Kurdê Azad' qebûl bikira; yan dê bi giştî qir bikira; yan jî dê dîsa weke berê bikira mêtingeha zordestên herêmê yên girêdayî xwe û ji bo berjewendiyên xwe bi kar bianiya. Ji bo ku ji aliyê paradîgmayî ve bi tevgera kurd re di nav nakokî û dijberiyê de bû, qebûlkirina hebûna kurd zehmet bû, ji bo pergala navendî. Di vê heyamê de qirkirina reş a bi rêbazên çors jî nedibû. Lewre riyek dima ku kesayeteke kurd ê 'noker-xayîn-radestkar' biafirîne û weke berê dîsa di statûya mêtingeh û bindestiyê de bihêle, sed salên din jî li ser vê nakokî û pevçûnê hebûna xwe ya li herêmê rewa bike. Ji bo wê li ser esasê bêbandorkirin û tasfiyekirina hebûna kurd û destkeftiyên wê dîsa weke berê, peywir dan cendermeyê pergalê, dewleta tirk!

**DAIŞ ajotin ser kurdan**

Dewleta tirk a nêzî 40-50 sal in hema bêje li tevahiya welêt li dijî îradeya azadîxwaz a gelên Kurdistanê şerekî bêhempa kir lê nekarî bi ser bikeve. Di encama dij-têkoşîna dewleta tirk a 40 salan ku bê encam mayî de zilhêzan asûna desthilatdariya tirk ji nû ve nirxand, nakokiya niha pergal bi desthilatdariya tirk re dijî jî ji ber vê ye.

Piştî wê, tevgera herî xedar a dîrokê DAIŞ hat peydakirin û dîsa pêşeng û îdeolgên wê, klîka serdest a tirk bû. Lewre dîsa hebûn û destkeftiyên kurd kirin hedef. Ji bo wê DAIŞ hat rêxistinkirin û ew ajotin ser kurdan. Xwestin li Rojava statûya hatî çêkirin bi destê vê tevgera terora dîrokê ji holê rakin. Piştî ku bi vê êrîşê jî nekarî armanca xwe pêk bîne, dewleta tirk bi xwe destpêkê li Efrînê, paşê li Serêkaniyê û Girê Spî dagir kirin.

Piştî Rojava, bemayiyên DAIŞ'ê li xwe kom kirin û li bakurê Kurdistanê êrîşî destkeftî û hebûna kurd kirin. Di pêvajoya xwebirêveberiyên Bakur de gelek bajarên Kurdistanê bi erdê re kirin yek, mirov bi komî di jêrzemînan de hatin şewitandin û tevgereke ku DAIŞ'ê xweziya xwe lê bîne, pêk anî!

**Nîvê Başûr dagirkirî ye**

Başûrê Kurdistanê sala 2017'an bi mafdarî xwest serxwebûna xwe ragihîne. Referandûma bi riyên demokratîk û aştiyane pêk hat, beriya dewleta Iraqê, dewleta tirk neyartiya wê kir û diyar kir ku wê destûr nede. Lewre êrîş li ser başûrê Kurdistanê pêk hatin û hema bêje ji nîvî zêdetir xaka Kurdistanê ji aliyê rejîma Iraqê ve bi piştgiriya dewleta tirk û Îranê hat dagirkirin, gelek destkeftî ji dest çûn.

Dewleta tirk bi wê ve jî sînordar nema, herêma başûrê Kurdistanê ji nîvî zêdetir bi awayekî fiîlî dagir kiriye û nêzî 30 baregehên dewleta tirk ên leşkerî-sîxurî li vê herêmê hene. Ji bo wê jî niha di serî de herêma Zînî Wertê, êrîşeke dijwar li ser Qendîlê pêk tê.

**Destkeftî hedef tên girtin**

Ne tenê herêmên Başûr, dewleta tirk êrîşê xwe heta herêma Şengalê, heta nav bajarê Silêmaniyê dde kirine û dixwaze bi giştî hebûna kurdan tasfiye bike, destkeftiyên kurdan ji holê rake.

Bi kurtasî dewleta tirk bi van êrîşan dixwaze Kurdistanê 'Sêgoşeya Stratejîk; Efrîn-Qendîl-Şengalê', ango Rojhilata Navîn bi temamî dagir bike. Çimkî ev sêgoşe ji aliyekî ve ji bo NATO-Ewropa, ji aliyê din ve ji bo hevpeymana Avrasya-Şanghay gelek girîng e. Ji bo wê ev êrîş li hemberî partî an jî hêzekê tenê nîne, li hemberî hemû aliyên kurdistanî ne. Divê hêzên kurdî û gelên Kurdistanê li dijî vê êrîşa berfireh hişyar bin. Li dijî vê çareseriya tekane jî yekitiya neteweyî ye.



# Çalakgerê rojiya mirinê Mûstafa Koçak jiyana xwe ji dest da



Navenda Nûçeyan

Çalakiyên greva birçîbûn û rojiya mirinê de piştî Endama Grûp Yorûmê Hêlîn Bolek, Mûstafa Koçak jî jiyana xwe ji dest da. Ji ber îfadeyên şahidekî nepen cezayê muebeta giran lê Koçak hatibû birîn. Koçak, li dijî vî cezayê neheq bi daxwaza darizandina adîlane sala borî ketibû greva birçîbûnê û di roja 90'emîn de greva xwe ya birçîbûnê wergerandibû rojiya mirinê.

Koçak, li Girtîgeha Hejmar 1 a Tîpa T a Kiriklarê, di roja 297'emîn a rojiya xwe ya mirinê de jiyana xwe ji dest da. Koçak, rojek berî mirina xwe bi rêya telefonê bi malbata xwe re hevdîtin pêk anîbû û ragihandibû ku bêhna wî diçikê û nêzane kut ê çi sere wî. Piştî vê hevdîtinê bi çend saetan Koçak jiyana xwe ji dest da. Malbata Koçak cenazeye kurê xwe ji Îzmîrê girt û bir li navçeya Esenyûrtê Stenbolê defin kir.

Partiyên siyasî bigire heta rêxistinên sivîl gelek sazî û dezgehan têkildarî mirina Koçak daxuyanî dan û ji ber nebersivandina daxwaza Koçak bertek nîşanî hikûmetê da. Sazî û dezgehan , destnîşan kir ku sebebê mirina Koçak hikûmeta AKP'ê ye û bang kirin ku herkes li dijî siyaseta mirinê ya ji hêla hikûmetê ve tên meşandin derkeve.

## TIŞTÊ DÊ JI ME RE BIMÎNE TENÊ SERBILINDAHÎ YE

# Em artêşeke zanistî ava dikin

→ Rizoyê Xerzî

Gelek xwendekar, nivîskar, rojnamevanên kurd hene ku ew derfet di destê wan de tune xwe bigihînin agahiyên akademîk an jî ji metodeke zanistî ya lêkolîn û nirxandinan bêpar mane. Yan jî li welatên wiha perwerde bûne ku derfetên perwerdeyeke zanistî û pirhêl bi destê wan neketiye

**Îbrahîm Seydo Aydogan kî ye?**



Îbrahîm Seydo Aydogan di sala 1976'an de li Qoserê hatiye dinyayê. Di sala 1997'an de li Zanîngeha Dicleyê beşa ziman û edebiyata tirkî xwendiye û li Stenbolê mamostetî kiriye heta ku bi xwe dev ji mamostetiya tirkî berdaye da ku li ser zimanê kurdî bixebite. Di sala 2001'î de li Fransayê bi cih bûye. Di sala 2003'yan de li Parîsê mastera xwe di warê wêjeya fransî de kiriye. Piştî tez û xebatên têkildarî zimannasî hêjayî nîşaneya 'alîkariya doçentiyê' hatiye dîtin. Niha serokê beşê kurdî ye li Inalco ya di nav civata kurdî de weke Sorbon tê naskirin.

*Bi kelecana destpêkirina zanîngeha kurdî ya online, me xwest ji bo xwînerên rojnameya xwe agahiyên berfirehtir bi dest bixin û me bi Seydo Aydogan re ku yek ji rêveberên vê xebatê ye, ev hevpeyvîn pêk anî.*

***Di destpêkê de ji we re dibêjim derbasî be ji ber vê belaya koronayê, gelo li Ewropayê bandoreke çawa li ser jiyana we kiriye?***

Di vê rewşa karantînayê de her kes ji xwe dipirse ka gelo mirov çawa xwe adapte bike mirov çawa bikare dema xwe derbas bike, ya girîng ew ku mirov biryarên baş bigire da ku di vê dewrê de ji xwe re jê îstîfade bike. Lewre hin adet û tevgerên me yên berê jî divê werin guhertin. Wekî mînak berê me çi dikir, piştî qedandina karê xwe yê malê û taştê yan em diçûn karên xwe yan jî em diçûn serdana dost û hevalên xwe. Yan jî em diçûn komeleke yan jî sûkekê û em li kafeyekê an jî li komeleyekê rûdiniştin an jî li nav sûkê digeriyan. Niha ew rewş hate guhertin êdî em li malên xwe asê man, divê em xwe li gorî vê rewşa nû adabte bikin. Ev tê wê maneyê heke em xwe li gorî vê rewşê adabte nekin û ji xwe re karên nû peyda nekin mirov dikeve nav aciziyeke giran û ev yek dikare bandoreke ne baş li ser derûniya me bike. Ji ber wê ye pêşinyara me ew e dema ku yek ji mirov bipirse û bibêje ka mirov dikare çi bike. Em dibêjin ji xwe re pirtûkan bixwînin, dema xwe bêtir bidin malbata xwe, ji ber berê di jiyana kar de mirov nikaribû zêde bi malbata xwe re demê derbas bike. Gelek însan hene dibe ku bi mehan me telefonî hev nekiribû, ji nû ve divê mirov di wan tiştan bifikire û mirov fîzîkî ne li ba hev be jî dikare ji bûyîna bi malbata xwe re îstîfade bike û bikaribe tiştên wiha bike ku ji hemû endamên malbatê re bi feyde be. Weke mînak li ser zimanê xwe bêtir grîfte û qaîdeyên zimanê xwe bêtir nas bike, mirov dikare hin nivîskarên wêjeya kurdî bixwîne ku berê me navê wan bihîstibû lê belê me nexwendibûn, mirov dikare wan bixwîne. Mirov dikare ji xwe re hin karên nû peyda bike . Mesele mirov dikare hin baldariyên nû ji xwe re peyda bike. Ji xwe hinekî din dîrokê bixwîne. Ne şerte ku her kes bixwîne kesên ku bala wan ne serxwendinê be jî dikare li ser înternetê li hin dukumenter û belgefîlmên li ser dîrok û jiyana kurdan temaşe bike.

***Ev fikra we ya avakirina zanîngeha kurdî ya online ji ku derket?***

Ez bi xwe di vê dewreya koronayê de çi dikim. Min xwest ez hinekî zimanê xwe yê îngilîzî xurtir bikim û min hin xwendin îngilîzî kirin û bi dûre min bala xwe da hin xwendinên ku min nekiribûn min bala xwe da wan, hin caran hin pirtûk bi destê min diketin min dianîn malê lê dema min tunebû ku wan bixwînim, min ew xwendin. Hin nivîs û gotarên ku biyaniyan li ser kurdan nivîsîne min bala xwe da hinek ji wan jî. Di arşîfa îngilîz û fransiyan de min hin tişt xwendin ku kesên biyanî di wan arşîfan de li ser kurdan çi difikirin.

Piştî wê me xwest pêwendiyek di navbera me û kesên bi kurdolojiyê re mijûl dibin çêbibe. Lewre jî me ev zanîngeha kurdî a online ava kir. Em bi gelek mamosteyên din ên ku li Ewropayê, Rojava, Kanada û Amerîkayê dijîn me têkilî bi wan re danî û me got em ji vê dewreyê û mayîna li malê istîfade bikin.

Gelek xwendekar, nivîskar, rojnamevanên kurd hene ku ew derfet di destê wan de tune xwe bigihînin agahiyên akademîk an jî ji metodeke zanistî ya lêkolîn û nirxandinan bêpar mane. Yan jî li welatin wiha perwerde bûne ku derfetên perwerdeyeke zanistî û pir hêl bi destê wan neketiye wek Tirkiye. Wekî mînak dema mirov li Tirkiyeyê perwerde dîtibe ji tiştên zanistî bêpar hatiye hiştin ji ber zanîngehên wî welatî di bin bandora îdyolojiya desthilatdariyê de tê meşandin û ji ber wê wekî mînak gelek agahiyên derbarê dîroka kurdan de dikarin bi şaşî werin dayîn da ku xizmeta îdiyolojiya desthilatdariyê bike.

***Hûn ê kîjan mijaran û di çi astê de dersan pêşkêş bikin?***

Mamosteyên me xwe gihande wan qebûl kirin û me beriya çend rojan dest bi zanîngeha kurdî ya online kir. Dersên mîna zimannasiya kurdî, wêjeya kurdî ya nû û klasîk, mîtolojî û felsefe, etnopsîkolojî, sosyoljî ango civaknasî , enteropolojî, ferhengnasiya kurdî û metedelojiya zanistî bê mirov çawa lêkolînên akademîk dike, mirov çawa bi çi prensîp û pîvanan lêkolînên akademîk dike û metodên wê çi ne. Em ê li ser wan jî dersan bidin. Normal me digot bila kontejana me 100 kes be lê me dît ku derket 320 kesan û hîna jî daxwaz hene lê me sekinand me got ewqas bes e.

***Zanîngeha kurdî ya online çi ye?***

Ev 10-12 sal in ku me û hin mamosteyên ku di warê kurdnasiyê de li deverên cuda dixebitin me ji hev re digot ka em çawa têkliyên bi hev re deynin û ji hev istîfade bikin. Bi taybetî 2 sal berê dema me amadekariyên avakirina zanîngeha Rojavayê dikir, wekî hûn dizanin min şêwirmendiya avakirina wê zanîngehê dikir, me hewl da ku ji dûr ve be jî em alîkariya avakirina zanîngehê û infarmasyona xwendekar û perwerdehiya xwendekarên wê bikin lê mixabin ji ber dûrbûnê û rewşa Rojavayê me nikaribû ji sedî sed vê fikra xwe pêk bînin. Axir ev rewşa karantînayê ji me re bû sebeb ku em li rêyên nû bigerin. Ji ber ku li Ewropayê jî em dersên xwe bi riya bernameya zoomê li ser internetê pêk tînin. Lewre me xwest wê fikra xwe ya ev 2 sal in em li ser difikirin pêk bînin. Ji ber me digot heke em nikaribin herin Rojavayê jî mamosteyê me dikarin her yek seatekê ji bo zanîngeha Rojavayê dema xwe veqetînin û bi riya skypiyê dersan bidin lê ew yek pêk nehatibû û gelek sedemên wê hebûn. Niha em tev di malên xwe de ne êdî mamosteyek nikare bêje dema min tune ye û gelek tiştên rojane ku rê li ber karên me digirtin ew jî ji holê rabûn ji ber ku em di malê de asê mane.

***Çend mamoste cihê xwe di vê înîsiyatîfê de digirin û heta niha çend kes beşdarî waneyan dibin? Mamosteyên bi wan re peyvîne kî ne?***



Ew mamosteyên ku em bi wan re peyivîn ev in: Michel Chyet, Mîchel Lizenberg, Abdulwehab Xalid Mûsa, Janroj Yilmaz Keleş, Jan Îlhan Kizilhan, Şêxul Îslamî, Dawud Yeşîlhan, Serdar Ay, Adnan Çelîk, Ciwan Abûheska, Cafer Hacer Petekaya, Xalid Huseyin em bi van hevalan re axifîn û me got em dixwazin bernameyeke wiha çêbikin û her kes li gorî pisporiya xwe bikare dersekê bide û ev yek dê derdora mehekê berdewam bike û em ê bikarin alîkariya gelê xwe bikin. Me pêşî got bila 100 kes bin 60 ji Rojava ku ji kesên ku bi kêrî Rojava were pêk bê û di dezgehên wê de bixebitin an jî di zanîngehê de an jî xwendekarên zanîngehê ne. Bila 40'ên din jî ji bakur û aliyên din ê welat û derveyî welat bin. Lê ji ber xwestek zêde bûn em mecbûr man ku heta roja çaran ji destpêka qeydê 320 kes werin qeydkirin. Niha me qeyd rawestandiye û hejmara kesên xwe qeyd kirine bûye 320 kes. Kesên ku navê xwe qeyd kirine mirov dikare ji bo tevan bêje ku ew entelejensiya kurdî ye. Ji ber ku hemû beşdarên me xwedî dîplomeya zanîngehê ne, an jî xwendekarên zanîngehê ne, an jî mamoste, yan jî di dezgehên kurdan ên çandî, ragihandin û dezgehên siyasî de dixebitin. Ev tê çi wateyê ev tê wê maneyê ku ev 320 kes tev pêşeng û rewşenbîrên civaka kurdî ne. Heger em mehekê bikarin ev mamoste tev li gorî pisporî û zanebûna xwe û di warê xwe yê akademîk de bikaribin dersan bidin û her wiha derseke metedolojiya zanistî jî bidin wan ev tê wê maneyê ku em cara pêşî artêşeke zanistî ava dikin.

Helbet li gorî kapasîteya xwe û zanebûna xwe, belkî gelek hevalên me nayê wê maneyê ku cahil û nezanin wekî Ehmedê Xanê gotibû Filcumle ne cahil û nezanin, heta di nameya ku min ji hemûyan re şand min got. Em di wê baweriyê de ne ku piraniya beşdaran ji xwe ji derveyî van dersan jî xwe gihandine asteke rewşenbîrî ya xwendinê. Em li vê derê dixwazin ji vê rewşê istîfade bikin û zanebûnên xwe yên salan bi wan re parve bikin nayê wê maneyê ku em ê wan fêr bikin lê em ê van zanînên xwe bi wan re parve bikin û ji bo ew jî jê istîfade bikin, ji xwe kesên nezan ji wan re dibe xezxîneyek. Bi vî awayî û bi zêdekirina derseke metedelojiya zanistî ji bo di siberojê de di civaka kurdî de derfet û îmkanên metedelojîk hebin bi vî awayî me xwest em bernameyeke komplet pêşinyar bikin. Di 8'ê nîsana 2020'an de roja çarşemê zanîngeha kurdî ya online dest pê kir. Ew ê heta 15'ê gulanê ku salvegera kovara Hewarê ye berdewam bike. Xwendevanên ku tevlê bûne 320 kes in. Ne hemû, heke 50 kes jî ji wan herin li gorî wê metodê lêkolînekê bikin û werin ji bo civatê pêşkêş bikin weke dersdariya me û paşê guh bide rexne û pêşinyaran û vegere ji nû ve li ser wê babeta xwe bixebite û dawî weke gotareke nivîskî bide me û civata nivîskaran jî, em ê dikaribin ji wan re ji bo xurtkirin û zanistîkirina gotarê li ser bixebitin hingê em ê dikarin ji wan gotaran pirtûkeke kurdolojiyê ava bikin ku dê bibe wekî çavkaniyeke sereke ji bo civata kurdnasiyê.

***Gelo ev tiştekî demikî ye ji ber vîrusa koronayê, an jî dê berdewam bike?***

Niha em ji bo carekê vî karî dikin lê gelek daxwaz hene ku ev kar her sal hebe û berdewam bike lê bi rastî em jî nizanin ku piştî ev kar bi dawî bibe dê çi bibe û li gorî nirxandinên ku paşê dê li ser vî karî werin kirin mirov dikare li ser bifikire. Bi rastî komkirina ewqas mamoste li ba hev û derxistina bernameyeke wiha ger mehek be jî wext û dem û kedeke mezin jê re divê.

***Gelo heke hûn karibin vê yekê berfirehtir bikin û bi riya kanaleke televizyonê, dê bêtir kes jê sûdê wernegire, hûn vê yekê çawa dinirxînin?***

Ji xwe me niyete ku em vê bernameyê bi her kesî re parve bikin ji ber wê yekê em hemû dersan qeyd dikin, kesên ku beşdar dibin çi li ser ekrana xwe dibînin ew tên qeydkirin. Paşê dê ji bo arşîfkirinê ji zanîngeha Înalkoyê û zanîngeha Rojavayê û ya Newrozê re werin rêkirin. Da ku paşê çi kesên bixwazin jê feyde bikin bikaribin lê vegerin. Lê pêşkêşkirina wê li ser ekrana televizyonê ew karekî din e, butçe û gelek tiştên din jê re divên. Niha niyeteke me ya wiha tune ye lê heke pêşniyar ji televizyonan werin çima na. Lê me bi xwe dema me dest pê kir fikreke me ya wiha tune bû, tenê ji ber xemxuriya xwe ya zimanê kurdî me xwest ku van zanînê xwe bi gelê xwe re parve bikin. Tevî ku rojê 6-7 saetan em bi vî karî dadikevin em gelekî kêfxweş in û em nawestin ji ber tu kar wekî karê ku tu ji bo xizmeta gelê xwe dikî nikare vê kêfxweşiyê bide. Hemû keda em didin di oxira kurdîniyê de ye, tiştê ku dê ji me re bimîne bi tenê serbilindahiya wê ye.

# Çîroka Nazmî

Dîyarî Asûr

> Naêşin û behsa êşê dikin, kêfê nizanin lê bahsa kêfê dikin. Ev însanên ku najîn û li ser jiyanê difikirin û li ser wateya jiyanê hevokan saz dikin, hinga dikevin etra gotinên xwe yên li ser jiyanê ka dê çi bêjin ji bîr dikin ku bijîn. Kenê min bi wan tê

Ev çîrok çîroka nazmî ye. Nazmî yê ku haya wî ne ji bûyerên welatê wî ne jî ji yên cîhanê hebû. Li gorî Nazmî jiyan ewqas ne hêja bû ku mirov serê xwe pê re biêşîne. A girîng ew bû ku ew kêliya tê de bû dijiya. Tim digot ev dinya xan e hinek dimirin hinek dijîn îro ez im sibê tu yî. Ew jî weka hemû heyiyên din ên li cîhanê dixwar, vedixwar, diçû, dihat, radiza û hwd. Pir jî cudahiyek di navbera wî û heyiyên din de tunebû. Nazmî gelek caran tenê ji bo ku tiştekî bêje tiştekî digot. Ji bo xeber bide xeber dida. Ne girîng bû çi digot hema çawalêhato xeber dida. Peyv û gotin li welatê Nazmî gelkî erzan bûn û ji ber wê jî li ba Nazmî peyv erzan bûn, wisa bi rehetî dihatin mezaxtin di devan de.

Ji bo Nazmî çiqas balkêş bû ku mirov serê xwe bi tiştinan an jî bi jiyanê ra diêşandin. Bi wî gelkî ecêb dihat û ya rast Nazmî ji wan kesên ku serê xwe bi wateya jiyanê re diêşandin hez nedikir, henekê xwe bi wan dikir. Bixwîne, bifikire, cardin xwendin û cardin fikirîn. Êêêê encam? Encam tune ye. Xwe bi xwe xeber dida. Ma gelo bi qasî ku mirov serê xwe pê re biêşînin hêja ye ev jiyan? Tev derew in. Mirov carekê tê dinê dijî û dimire. Piştre? Piştre tiştek tune, kî bêje heye jî derew e. Min bixwe qet pêwîstî nedît ku ez li ser jiyanê bihizirim. Ez ê ji bo çi bihizirim? Ez bixwe va heme û dijîm ma ev ne bes e? Tew îca ez ê rabim bi ser de ev tişta ku jixwe tê de me bifikirim? Na, ez ê tu car nefikirim û nikarim bifikirim jî. Hema kêlîka ku ez hay jê dibim ku difikirim êş dikeve serê min. Ev însan xweş zanin bi tiştên ne tişt dakevin û xwe pê mijûl bikin. Ew bi xwe qet najîn û bi ser de radibin hevokên qirase rêz dikin wek morîkên gerdeniya diya xwe. Naêşin û behsa êşê dikin, kêfê nizanin lê bahsa kêfê dikin. Ev însanên ku najîn û li ser jiyanê difikirin û li ser wateya jiyanê hevokan saz dikin, hinga dikevin etra gotinên xwe yên li ser jiyanê ka dê çi bêjin ji bîr dikin ku bijîn. Kenê min bi wan tê.

Bîra Nazmî gelkî ko bû, tişta zû ji bîr dikir. Navên mirovan kêm di bîra wî da diman. Carna jî ji bo navê hin kesan ji bîr neke ew bi xwe navekî din li wan kesan dikir. Ne tenê navan, bûyer û serpêhatiyan jî li gorî xwe bi navên cuda qeyd dikirin di hişê xwe de, da ku rojek peyv bê ser yek ji wan kesan an jî bûyeran bikare çend tiştan bibêje. Tiştên ku digotin jî ji ber ku heman tişt bûn piştî demekê gotinên wî dubare sêbare dibûn. Weke qeydiya bandekê. Wexta bahsa meseleyekê dikir mirov dizanî dê li pey kîjan hevokê çi bê gotin. Yek ji van meseleyên Nazmî ku her tim dikarî dubare bike û her cara weke ku ji nû ve gotibe wisa xweş behs bike çîroka Ûsif û Durdaneyê bû. Wexta ku behsa çîroka wan dikir tew… Çiqas kêfa wî dihat, weke zarokekî bi çîroka xwe şa dibû. Li gorî ku Nazmî digot;

Durdane keçeke têra xwe delal bûye. Delaliya wê li ser tu keçeke din ên li taxê nîn bûye, çi cilûbergên ku tu kes nedikarî û nediwêrî li xwe bike Durdaneyê li xwe dikir û zahf jî lê dihatin. Lê heyfa Durdaneyê ku bextê wê bi qasî delaliya wê nîn bû. Wê dan mêrekî ku di emrê kalikê wê da bû. Mahra wê bi extîyarekî ra birîn.




Navê vî extîyarê me jî Ûsif bû. Ma devê xelkê ne doxîna mirov e ku mirov pê bigre û bişidîne, wisa jî xelk li ser zewaca wan xeber dida. Li gorî şimopiviyê xelkê Durdane ji bo perekê Ûsif pê re zewicîbû. Nazmî wexta vana dibêje xemgîn dibe ji ber ku esil ev xeberdanê ha tev derew bûn. Durdane ne keçeke wisa bûye û têra xwe bi esil bûye. Ji qewlê Nazmî ve ew weke milyaketeke xwedê ewqas pak, diltenik, nazenîn û henûn bûye. Bi mêrê xwe re her daîm rast bûye. Nazmî li vira di carekê de peyvê tîne ser mirina Ûsif. Ûsif dimire û Durdane careke din nazewice. Xwedî li miriyê xwe derdikeve û heya dawiya emrê xwe jî pê re dilsoz dimîne.

Nazmî her cara ku vê çîrokê digot xemgîn dibû. Zahf hez dikir ji vê çîrokê. Wî dikarî di carekê de dest bi vegotina vê çîrokê bike û bi dawî bike. Destpêk û dawî… Li gorî Nazmî her tim destpêkek û dawîyek hebû. Mirov tên dinê û dimirin. Mirov ji ber ku xwedê dixwest dihatin dinê, ev destpêk bû û cardin ji ber ku xwedê dixwest rihê ku bi emanetî daye wan ji wan bistîne distand, ev jî dawî bû. Dawiyeke mecbûrî. Û di dawiyê de Nazmî cardin dihat serê destpêka peyva xwe û digot; ma hewce ye mirov ewqas serê xwe bi jiyanê re, bi bûyeran re û bi dinê re biêşîne? Ma dinya ji kê re maye ku ji min re bimîne. Dinya ne milkê bavê kesî ye û ji kesî re namîne. Dinyaya ku ji Siltan Silêman re nemaye qey wê ji min û te re bimîne..!

# Takamul û werara lêkerên kurmancî

Dogan Hejar

Ji bo kesekî/ê dixwaze kurmancî hîn bibe, yek mijara herî dijwar jî hînbûna lêker û rayekên wan e. Helbet ev rewş ji bo zimanên din jî derbasdar e lê di kurmancî de rewşeke taybet, ya rastir guherîneke dibe sedema tevliheviyê heye. Ger mirov ji wê guherînê haydar be, wê gavê mijara lêkeran dê zelaltir bibe.




Weke mînak em li lêkera "revîn-reviyan"ê binihêrin.

Awayê resen ê vê lêkerê "reftin" e ku di farsî de, di wateya "çûyîn"ê de weke "reften" tê bilêvkirin. Rayeka wê ya dema borî her wekî farisî "reft" û rayeka dema niha jî "rev" e. Lê di kurmancî de ev lêker bi awayê xwe yê resen hatiye jibîrkirin. Bi çi awayî? Pêşiyê li ser rayeka dema niha "rev"ê bi alîkariya paşgirên lêkersaz "în" û "iyan"ê bi formeke din hatiye çêkirin ku em niha weke "revîn-reviyan" û rayeka wê ya dema borî jî weke "revî-reviya" bi kar tînin. Ji mînakên rojê jî îro diyar e ku forma resen û forma nû demeke dirêj pevre hatine bikaranîn lê bi demê re forma resen ji holê rabûye. Em bi mînakeke ku wê mebesta me zelaltir bike bidomînin

**Şikestin**
**Şikîn-Şikiyan**

Roja me ya îro herdu formên vê lêkerê jî hene.


Awayê resen şikestin e û rayeka dema borî "şikest" ya niha jî "şikê-şik" e. Mîna me xwest em li jorê werara wê rave bikin, li ser rayeka dema niha bi alîkariya qertafa lêkersaz "iyan" formeke nû derketiye holê û awayê nû bûye "şikiyan". Ya balkêş ew e ku berevajî lêkerên weke "nivîsîn (forma wê ya resen bi awayê "nivişt" weke navdêr hêj heye), keniyan, reviyan, geriyan, naliyan, liviyan, firiyan" û hwd. hêj forma xwe ya resen wenda nekiriye.

Zimanên bingehên wan yek in, her çi qas ji hev cihêtir û hay ji hev tune bin jî di hin mijaran de dibin rêwiyên heman rêyê. Lewre ev form bi awayekî şermende û bi fikar weke îstîsna di farisî de jî derketiye. Di farisî de paşqertafa lêkersaz weke "îden" derdikeve pêşberî me. Ev paşqertaf bi gelemperî ji navdêran lêkeran çêdike. Lê di hin lêkeran de mîna kurmancî bi rêya rayekên dema niha yên lêkeran formeke nû çêkiriye. Mînak:

"Geşten" rayeka vê lêkerê ya dema borî "geşt" ku hêj di kurmancî de weke navdêr tê bikaranîn, rayeka dema niha jî "ger" e û li ser rayeka dema niha bi alîkariya paşqertafa "îden" forma nû "gerdîden" derketiye holê û mîna "şikestin û şikiyan" a kurmancî li gel forma resen "geşten" ê tê bikaranîn.

Dibêjin di deryayê de kevir çi qas demdirêj bimînin ew qas biçûk dibin û dibin xîz. Bi ya min kurmancî jî ew çend kevnar û kohne ye ku peyv û bêjeyên wê biçûktir û kintir bûne û formên nû li xwe bar kirine.

Sîdar Jîr



## Bablîsoka Sî'bera ZeyNO

Di edebîyatê de sînor çiqas ji holê radibin, bergeha nivîskar ewqasî fireh dibe, azadî dest pê dike… Di wê bergeha fireh de êdî xeyala nivîskar çi toz û dûxan rakir û li pey xwe hişt, em xwîner li gorî wê toz û dûxanê yan jî li gorî wê bablîsokê xwe li ber berhemê xweş dikin.

Li ber *sîya valahîyê* xwîner dibin şahid û hevkarên Sî'bera Zeyno û bi bêhnçikandina Fendo ya ku ji siberojê ber bi donapêr ve berovajî dike helkehelk.

H. Kovan Baqî, hemû romanên xwe bi tirbûna çîroknûsîya xwe honandiye. Sî'bera Zeyno (Sîya Valahîyê) ku serboriya însên ji beriya Adem û Hewayê digire dest û tîne di deriyekî buhiştê re dixe hundir û li wir nasekine bi lez û bez di deriyê pêş re, bi eşkereyî dîsa ji wê buhiştê derdixe… Ev yek jî wê bablîsoka ku xwîner dibînin û hewl didin xwe li ber xweş bikin, bi bayê Zeynoyê dibe ne-kesek."*Çi cara dilê me bixwaze, bêyî ku cih û war û zeman ferq bike, em her du vedigubêzin û dibin ne-kesek…rp27*" nivîskar gelekî bi koneyî sînyala ku divê xwîner jî xwe nexe tu qalib û qeydan di ber guhê/çavên me re davêje…

Di edebîyatê/hunerê de ya herî zehmet ew e ku berhemek devê xwe di zêmka gelek şax û bineilmên cîhanî û rûhanî xwe û jê xwedî bibe, mezin bibe û li bergeheke fireh bibe bablîsokeke *bêar*! Lehengên romanê ZeyNo û FenDo, di nav jiyaneke rastîn de bi bayekî MÊrolojîk bablîsokekê radikin. Ev yek jî rê lê vedike ku xwîner di ser *ne-kesek*bûna xwe re, hay ji serboriya xwe ya mîtolojîk, dîrokî û felsefîk çêbibe. Şer û pevçûnên rojane di romanê de xwe digihîne serdemên arkaîk û Kovan Baqî bi vegêraneke *bêrêgez û wêrek*(!) serboriya me û sedema hebûna me bi şabûnên ZeyNo û FenDo vedibêje: "*Ma qey însan giştik seba şerr bikin diwelidin, yan diwelidin seba- rp. 89*" Di romanê de gelek hevokên bi vî rengî hene hem xwîner ji bo kêlîyekê didin sekinandin û hem jî dihêle ku bêhtir bide nav pirtûkê. Ji ber ku ji Zerdeşt, Adem, Hewa, Enkido, Gilgamêş, Freûd, Mem û Zîn û Konfîçyûs, Wolf, agir û avik û hemû lehengên mîtosîk û qebqebeyên dewr û zemanên xwe bi hev re bablîsoka Sî'bera ZeyNoyê diafirînin. Bi afirandina bablîsoka ZeyNoyê û agirberdana FenDo re, em pê dihesin ew zêmka wan şax û bineilmên cîhanî û rûhanî ku lehengên Kovan Baqî pê mezin bûne îro di hemû reh û bedena mirovahîyê geriyaye.

Lê ew bablîsok ne wekî sûr'a Îsrafîl e, dawî li cîhaneke beşerî nayne, berovajîya wê, vejîn e, destpêk e, şabûn e, qebûlnekirina buhiştê ye û derketina bi lez û bez a di deriyê pêş re ye…

Di romanê de ji bilî lêpeydakirinên efsanewî, mîtosîk û felsefîk nivîskar wekî îluzyonîstekî bi tîp, gotin û hevokan dilîze. Bêguman pêlistina nivîskêr ne tenê bi peyv û hevokan e û ne ewqasî hêsan û bêguneh e jî… Wekî mirov marekî teyar deyne ser sînga xwe û pê şa bibe. Heger yek liva mirov li xweşa marê teyar neçe, şabûn êdî diçe şerr dimîne… Kovan Baqî bi vê wêrekiyê Sî'bera ZeyNo nivîsandiye. Bi îluzyona hunera xwe mar li ser sînga FenDo bi mêbûna Zeynoyê şa dibe…

**Sî'bera Zeyno- Baqî, H. Kovan, rêzeroman-I, 122 rp, Weşanên J&J, 2017*

# Korona û kapîtalîzm

Hisên Çatikkaş

Mirin, xweza, exlaq û wijdan hatibû jibîrkirin û dibe ku korona van nirxan bîne bîra mirovahiyê. Heke mirovahî bi vê pergalê jiyana xwe bidomîne, dê bobelatên mezintir bibîne. Felaketa herî mezin a hatî serê mirovahiyê ev pergala kapîtalîst bi xwe ye




Di vê nivîsê de em ê li ser pergala kapîtalîst û felaketên avakirî bisekinin. Yek ji van felaketan korona ye ku îro mirovahî kiriye girtîgeheke mezin. Koronaya ji bajarekî Çînê derket û weke "bandora perpirîkê" li hemû cihanê belav bû, her tişt serobino kir. Weke mirovek darikekî bixe qula mozan, koronayê jî darikê xwe kiriye qula pergala kapîtalîst. Her tiştên ku vê pergalê pê pesnê xwe dida niha nikarin li hemberî darikê koronayê xwe biparêze an jî nikare tiştekî bike. Ango em dikarin bêjin ku ev pergal ketiye asta destşûştinê.

Koronaya ku li seranserî cihanê belav bûyî, gelek tiştan tîne bîra mirovahiyê û gelek tiştan ji mirovahiyê distîne. Ev bobelat her roj bi hezaran kesî dikuje û bi dehhezaran kesî jî nexweş dixîne. Ne diyar e, dê heta kengî bidome jî lewra vê bobelatê tirseke mezin kiriye nav dilê mirovahiyê. Mirovahî ji mirinê ditirse. Ango koronayê mirin aniye bîra mirovahiyê. Ji ber vê yekê jî mirovahî li hemberî koronayê ketiye şerekî man û nemanê. Lê di şerê li hemberî koronayê de f-16, tank, top, S-400, fûze ango çek û çebilxane bêfeyde ne. Li aliyê din mirov dibêje qey heta niha kes nedihat kuştin. Dibê qey heta niha şer li ti deverên cihanê nebû û kes ji ber şer nedimir. Bi awayekî din dibê qey heta niha di şerê Sûriyê de 500 hezar kes nemirine. Baş e! Heke her tim mirin/kuştin hebe, ev tirsa mirovahiyê ji ber çi ye? Helbet ji ber ku koronayê mirin aniye ber deriyê her kesî. Li vir pirs tê guhertin: nexwe mirovahî dibêje; mirin ji min dûr be, xem tune ye? Ango heke mirin tenê li Sûriyê be, balafir dikarin bifirin, danûstandin dikare bê kirin, maxazayên mezin dikarin vekirî bin, turîzm dikare raneweste û fabrîqe dikarin karên xwe bidomînin! Bi gotineke din pergala kapîtalîst bimeşe, xema mirinên li Sûriyê nake. Heke wiha be, pirsgirêka ehlaq û wijdanê dikeve dewrê. Belê di vê pergala kapîtalîst de mirovahiyê ehlaq û wijdana xwe ji bîr kiriye. Lê weke Camusî jî gotî: "Felaket, tiştekî hevpar e, lê dema hate serê mirov, mirov di bawerkirinê de zehmetiyan dikişîne." Belê korona jî felaketeke hevpar e ji bo mirovahiyê lê mirovan bawer nedikir bê serê wan. Îro mirin weke Sûriyê li her welatî xwe nîşan dide û mirin li her welatî şilftazî li holê ye. Bêyî ku destûr bixwaze, bêdeng û bêxwîn dikeve nav malên her kesî. A ku mirovahiyê ditirsînê jî ev tişt e.

Belê me got koronayê gelek tişt ji mirovahiyê standin. Yek ji van azadiya pergala kapîtalîst a daye mirovan! Di vê pergalê de mirovan xwe azad hîs dikirin. Mirovan behsa azadiya gerê, jiyana taybet û heq, hiquqê dikir. Lê ji bîr dikirin ku di demên felaketan de hemû mafên vê pergalê tune dibin. Di van rojên koronayê de kî dikare behsa mafan bike? Hemû 'maf' hatine rawestandin. Ango hemû maf bûne qurbana mafekî, ew jî mafê jiyanê ye. Di demên felaketên wiha de pergala kapîtalîst dibêje; kî karibe jiyana xwe bidomîne, ew jêhatî ye. Baş e! Lê xulamekî vê pergalê wê li gorî xwediyekî vê pergalê di demên bobelatên wiha de çawa karibe jiyana xwe bidomîne? Vê pergalê dewlemend/xwedî ava kirine, ew dema dixwazin, li nexweşxaneyên herî baş li cem dixtorên herî jêhatî tên dermankirin. Lê feqîrek/xulamek wê çawa bike? Ew pergal bi salan e mirovahiyê bi azadiya xapînok kontrol dike, lê dema vê dike jî her roj bi hezaran mirovî dikuje, xulam û xwediyan ji xwe re çêdike. Ango ev pergal her tim diyalektîka di navbera xulam û xwedî de asêtir dike. Ev pergal, pergaleke kujer e, di demên asayî de jî di demên felaketan de jî. Lewma heta ev pergal li cihanê hebe, wê kuştinên hêsan û erzan li cîhanê xilas nebin. Ango felaketa herî mezin a hatî serê mirovahiyê ev pergala kapîtalîst bi xwe ye.

Beriya du sed salî fîlozof Nietzsche gotibû: "Xweda mir û mirovan ew kuşt." Ev gotin ji bo nirxên mirovahiyê hatiye gotin. Belê gotina du sed sal berê hatî gotin îro jî xwe dubare dike. Beriya koronayê, li vî gundê em lê dijîn, mirovahiyê nirxên xwe ji bîr kiribûn. Mirin, xweza, ehlaq û wijdan hatibû jibîrkirin. Wê demê em dikarin bêjin, dibe ku korona van nirxan bîne bîra mirovahiyê. Heke mirovahî ji bilî pergala kapîtalîst van nirxan ji nû ve binirxîne û wan ji nû ve ava bike, dibe ku xwe ji bobelatê bi vî awayî rizgar bike. Na heke bi vê pergalê û bênirx jiyana xwe bidomîne, dê bobelatên mezintir bîne serê mirovahiyê.

Çawa beriya çend mehan mirovan bigota wê balafir bisekinin, wê çûnûhatina mirovan a di navbera welatan de bê astengkirin, kesî bawer nedikir. Îro jî hemû mirov li benda derbasbûna van rojan e. Gelo wê ev rojên koronayê kengî xilas bin? Çend salên din wê fikra mirovan li ser koronayê çi be? Tişta xuya dike ev pirs wê heta demekê bên pirsîn. Lê her pirs bersiva xwe jî bi xwe re tîne. Nediyarbûna bersivên van pirsan li aliyekî heta pergala kapîtalîst hebe wê mirovahî li gelek bersivên ji ber felaketan bigerin.

# Kurdistanîca

Şengul Ogur

Di cihê xwe de sekinîbû. Weke peykerekê bû ku li kêliyekê hatibû çikizandin. Lê ne peyker bû. Zindî bû. Bi goşt û hestî bû. Ji nîvî pê de zeniya xwe dabû ser pehniya destê xwe, argûşka wê heta bi hinarikên wê bi destê wê hatibû girtin. Tilîka wê ya ku hungilîsk tê de bû, li biniya çavê wê sekinîbû. Bi vî rengî ji giraniya fikra serê xwe re destê xwe kiribû palpiştek. Ma ne mirov dema ku li tiştekî kûr û dûr difikire hîseke giraniyê bi mirov re çêdibe, serê mirov bi mirov giran tê, mirov bi dest xwe re destê xwe dide ber serê xwe û serê xwe hinekî bi ser destê xwe de xwehr dike.

Erê bar li ser kabokên wê bû lê wê giraniya li ser kabên xwe hîs nedikir. Giraniya di serê wê de bêhtir zor lê dikir.

Ser, rû û çavên wê weke tabloyekê bû. Êş, xemgînî, şaşmayin, hêrs, behitîn, ferihîn, veciniqîn, girî, dînbûn, tengijîna dil û rih hemû bi hev re di vê tabloyê de hebûn.

Dema ku mirov dêhna xwe dida ser vê tabloyê rengê şaşmayinê pir beloq bû. Şaşmayin li bara rûdanekê, ma ne gava pêşî ya fêhmkirinê ye. Piştî ku şaşmayin diqede, fêhmkirin dest pê dike, mirov êdî diêşe, xemgîn dibe, hêrs dibe, dibehite, diferihe, vediciniqe, digirî, rih û mêjî ditengije. Êş, xemgînî, hêrs, behitîn, ferihîn, veciniqîn, girî, dînbûn, tengijîna dil û rih hemû li ser şaşmayinê raxistîbûn.

Kabên wê dilerizîn ji ber giraniya barê li ser. Lê wê hay jî lerza kabên xwe nebû. Awirên wê li ser barê li ser kabên wê bûn. Nedizanî bê ka biêşe, bigirî, xemgîn bibe, bibehite, biferihe, vecinqe. Awirên wê yên ji ber şaşmayinê bû.

Bi şaşwazî li barê ser kabên xwe dinêrî. Barê li ser kaba wê tabloya Kurdistanîca bû.



# Roj û mehên xwedî peyam



Dîlan Aydin

Van rojên ku nexweşiya li nav alemê belav bûye, ne tenê li ser gel an jî welatek; bi awayê adil hema bêje li ser tevahî civak û welatan heye; hestên nû bi me re çêdibin. Çi ne ev gelo? Wekhevî! Lewre alem tev bi heman rengî hewl dide xwe biparêze, ji vê belaya 'nedîtî' xwe xilas bike. Bi rastî jî ev hesteke pir cuda ye lewre bi dersên têr û tije dagirtî ye. Dibe ku gelek ji me aliyên wê yên erênî û bi peyam baş nebînin, tênegihîjin lê ji dil bawer dikim ku ji bo aliyê me yê manewî (ku qet bê wê nabe) yê hatiye tevizandin, dikare bibe derman.

Gelo êşa vê nexweşiya biçûk, nedîtî, veşarî, bi qasî ya şer û pevçûnên ku dewlet û desthilatdariyên despot li ser serê gelan dimeşînin mezin û bi bandor e? Trajediyên ku mexlûqên herî bi şeref (!) anîne serê însaniyetê, serê xweza û gerdûnê, ji vê yekê sed qat xirabtir û dijwartir nîn in? Em ji bo xwe bibêjin; hovîtiya ku em kurd ji sedan salan heta îro, pê re rûbirû mane, ne sed car, hezar car ji vê bi zirartir, xirabtir û hovtir nîn e? Em wiha jî dikarin bibêjin; bi hezaran hovên ku ne dişibin însan, ne jî heywanan, serê 7-8 salan e bûne belaya serê axa me, ji vîrusa heyî wisa xirabtir in ku em nikarin tu navî ji wan re bibînin!

Em baş dizanin ku yên berê wan vîrusên wekî cinawiran dan welatê kurdan, cih û warên wan xirab kirin, talan û dagir kirin, ev pergal in û îro ji ber wî 'tişta nexwiyayî' nizanin çi bikin! Ên ku sedema şerê li dijî kurdan in, hevkarî û piştgirî didin her cure hovîtiyê, sedema bi hezaran jin û mêrên li zindanan in ev dewletên navdar bi xwe nîn in! Loma jî ev roj ji bo me û ji bo 'wan' divê bibin ders. Divê em li dîrokê mêze bikin, bibînin ka ji ber çi bûyerên wiha xwezayî (an jî îmalkirî) çêbûne? Destên xwe bidin ser wijdanê xwe (ger ku hebe) baş bifikirin, dûr bibînin û rast bibihîsin ka însan, alem ji ber çi di vê rewşê de ye?

Însan, ger xwe xwedî bîr û bawerî bibîne, divê heta bijî, xwe berpirsiyar jî bibîne. Berpirsiyarî, pirs û lêpirsînê bi xwe re tîne ku ev nebe tu kes ji me li ku dibe bila bibe nikare bibe xwedî roleke baş, pêwîst û erênî. Niha berpirsiyariya famkirin û têgihîştina vê rewşê li pêşiya me hemûyan e. Divê em ne tenê ji aliyê bedenî ve li ser xweparastin û xilasbûna ji vê rewşê bifikirin; ji aliyê manewî ve jî xwe ji xeflet, seranserî nêzîkahiya li jiyanê, li xwe û hev, ji gunehên xwe yên ku bi xwe re gelek nexweşiyan tînin paqij bikin, van rojên xwe bi kar û ramanên pêwîst têr û tije derbas bikin.

Ev roj, xwedî peyamên têr û tije ne. Pergala ku bi sedan salan e xwe jêneger dibîne, dest davêje her tiştî, bi wate û nirxên civakî yên hezaran salan dilîze, vala û pûç dike; her tiştî ji bo berjewendiyên xwe di bin navê pêşketinê de ji koka wê vediqetîne, desteser û tune dike, bêdeng e, hepskirî ye û bi hejmara miriyan re mijûl e! Hêvîdar im di serî de ew pergal, em hemû kesên ku xwedî îdiaya 'li dijî pergala kapîtalîzmê' (hevoka kapîtalîzma bê destnimêj tam li gorî vê rewşê ye) ne şiyar bibin, ji nû ve bibin 'însan' li nirxên xwe yên madî û manewî vegerin. Yan na ger rewş wekî heta niha, tenê bi daneyên der barê hejmara miriyan de bidome dê tu tişt neguhere. Ji ber ku ev vîrus wekî me li jorê jî got, di ber guneh û jirêderketina pergala ku bi sedan sal e li ser kar e, pir biçûk, mehsûm û bêguneh e!



Dr. Abdulillah Polat

## Li ser rewşa ruhî bandora koronayê

Li gelek welatan ji bo belavbûna şewba koronayê bê kêmkirin tedbîrên hişk tên wergirtin. Bêkontrolî û kêmbûna mesafeya civakî fikaran zêde dike. Tundiya nav malbatê û întixar jî di vî warî de fikarên sereke ne.

Şewba koronayê, li gelek welatan jiyana rojane di hefteyekê de serobin kir. Divê bê bibîrxistin ku ev yek ji bo her miroveki, bi taybetî jî ji bo kesên xwedî nexweşiyên derûnî rewşeke xetere ye. Pênaseya "betlaneya koronayê" ji bo tarîfkirina vê rewşê pênaseyeke şaş e û xwexapandin e.

Ev rewş, di xwe de potansiyela pevçûnanan dihewîne û li dijî tirsê, di tevgerên kesan de bi berteka "bireve an şer bike" xwe dide der. Lê ji van yek jî di vê atmosferê de nikare aktîf be an jî rê li ber atmosfera pêwîst veke. Beriya niha rewşeke wiha hema hema qet nehatibû serê mirovan û tevî karantînaya heyî, îzolasyona hevkariya civakî jî weke pirsgirêkeke sereke dertê pêşberî me. Fikarên der barê aboriyê de jî weke vê ne.

Îzolasyona civakî di demek kurt û kêm dirêj de rê li ber xerabûna fikaran û xewê vedike. Ev yek jî nîşanî me dide ku mirov wê her bitengijê û bikeve ser şopa tenêtî, bêhêvîtî û depresyonê. Ger tedbîr neyên girtin, ev rewş wê veguhere qada hêrsê, şikestina xeyalan, pêneewletî, êrîşkarî û hînbûna madeyan ku her yek ji van, mijarên zanistên derûniyê ne. Divê mirov zanibe ku di atmosferên wiha rîska hînbûna alkolê, hebên xewê, dermanên janbir û tevizandinê jî derdixin holê.

Mijareke din a girîng jî ew e ku ji ber karantînayê kontrola civakî ne mumkun e. Bi taybetî jî di warê eşkerekirina şîdeta malbatê ya li ser zarokan de. Dibistan, krêş an jî nihêrvan di eşkerekirina bûyerên wiha de navbenykarên herî girîng in. Lê niha ji ber reşwa karantînayê ev her sê mekanîzma jî betal bûne û ev yek jî rewşa kontrolê xerabtir dike.

Bêyî ku şewbek hebe ango di rewşeke civakî ya normal de jî texmînî hejmara şîdeta nav malbatê ji sedî 80 ye. Piraniya mexdûran zarok û jin in. Di bûyerên wiha de ji civakê beşeke biçûk tê tedawîkirin. Ev jî nîşan dide ku di civakê de şîdeta li jinê û zarakon çiqas pirsgirêkeke girîng e û mixabin ji ber vê şewbê kontorla vê rewşê zehmet e. Ji xwe şîdeta heyî, bi vê şewbê re bêhtir tevlîhev bû. Lewma tirs ew e ku di nav çend hefteyan de şîdeta nav malbatê de derkeve asteke bilindtir. Dîsa jî tecrubeyên Çîn û Îtalyayê diyar in ku şîdeta li dijî jin û zarokan wê bibe sedema fikaran.

Tengezariya rewşa niha nîşan dide ku serî derketina bi kesên nexweşên zîhnî re, ji yên din zehmetir in. Komên wiha birîsk, li hemberî stresê bêhtir hesas û xwedî tirs in. Her wiha meyla wan a depresyonê û semptomên bêhtir jî heye. Bi taybetî di vê demê de, ji bo pêşî li întixaran were girtin divê zêdetir baldarî û tedbîr hebin. Ji van tedbîran jî helbet dewlet, civak û mirovên xwedî erka siyasî berpirsiyar in. Heke berpirsiyar di vê mijarê de ne hesas bin û tedbîran di wextê de negrin, wê di mexdûrên vê rewşê de travmayên heta hetayî peyda bibin.

Divê neyê jibîrkirin ku tecrubeyên şîdeta nav malbatê ya dema zarokatî û xamatiyê, bi awayekî neyênî derbasî nifşên bê dibin. Mexdûrên kevin di pêşerojê de dibe ku bibin failên vê rewşê an jî dibe ku dîsa bibin mexdûrên rîska şîdetê. Ji ber vê yekê divê mirov xwedî berpirsiyarî be û hevkariya civakî zêde bike, xwe bi îzolasyonê re zêde bernede.

# Sistkirina tedbîran xapandinek e!

Navenda Nûçeyan



Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê, li hemberî biryarên sistkirina tedbîran raya giştî hişyar kir û got: "Xwe nexapînin. Hêj rêyek dûr û dirêj li pêşiya me heye ku derbas bikin. Dê demek dirêj ev vîrus li gel me bimîne."

Vîrusa koronayê (Covid-19) tevahiya cîhanê xistiye bin bandora xwe. Li her welatî geşedan, tedbîr û dane diguherin. Her saeta ku derbas dibe ji bo civakê dibe sedema mezinbûna tirs û fikaran. Li aliyekî bîlanço giran dibe, li aliyê din tedbîrên curbicur tên girtin û her wiha li dijî vîrusê lêkolînên ji bo parzayê (aşî) hene.

Li gel tedbîrên giştî yên dewletan civak, malbat û kes jî li dijî vîrusê tedbîrên xwe digirin. Li gel tedbîran li tevahiya jiyanê vîrus bandore xwe didomîne. Welatên herî zêde di dibin bandora vîrusê de ne jî Amerîka, Îtalya, Îspanya, Fransa û Qraliyeta Yekbûyî ye. Her wiha li gorî daneyên zanîngeha Johns Hopkînsê, li cîhanê di hejmara nexweşan de Tirkiye jî di rêza 7'an de cih digire. Li gorî daneyên dawî jî li tevahiya cîhanê 3 milyon kes bi vîrûsê ketine.

Midûrê Giştî yê Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) Tedros Adhanom Ghebreyesûs bal kişand ser tabloyên demên dawiyê û raya giştî hişyar kir û got: "Divê em xwe nexapînin. Hê jî rêyeke dûr û dirêj li pêşiya me heye ku em derbas bikin. Dê demeke dirêj ev vîrus li gel me bimîne."

**Şerê li ser maskeyan**

Li dijî belavbûna vîrusê li gelek welatan tedbîrên cuda hatin girtin. Di nav tedbîran de bikaranîna maskeyan jî heye. Li hin welatan bikaranîna maskeyan hat ferzkirin. Piştî ev mijar derket pêş li her welatî pirsgirêka maskeyan rû da û di navbera dewlet, şîrket û rêveberiyên xwecihî de pêşbirkek derket holê. Lê asta pêşbirkê gihaşt rewşeke xeternak.

Di nav Yekitiya Ewropayê (YE) de tenê li çar welatan maske, lepik û kincên xweparastinê tên hilberandin. Lê niha ev welat ji bo hewcedariyên xwe hilbêrînê dikin. Nûnerên gelek welatan ji bo malzemeyên tibbî ji fabrîqeyên Çînê bistînin di nav pêşbirkê de ne. Berpirsyarên servîsa gumrukê ya Çînê da zanîn ku ji 1'ê adarê û vir ve ji bo 50 welatî 3.86 milyar maske, 37.5 milyon cilên xweparastinê, 16 hezar cîhazên hilmstandinê û 2.84 milyon amûrên testê firotine. Maliyeta vê firotinê jî bi giştî 10.2 milyar yen ango 1.33 milyar euro ye.

Amerîka, li Bangkoka Taylandê dest danî ser kargoya maskeyan ya Almanyayê û rêveberiya Berlînê ji bo vê yekê pênaseya korsanî kir. Her wiha 6 milyon maskeyên Almanyayê dîsa li balafirgeha Kenyayê winda bûn. Komara Çekê jî dest danî ser malzemeyên parastinê yên Îtalyayê. Fransayê jî maskeyên ji bo Îtalya û Spanyayê diçûn asteng kir. Her wiha Amerîka jî bi rêya navbeynkaran bi 3 caran li nirxê maskeyên ji bo welatên din hatine amadekirin distîne.

**Ji madeyan jehrî bûn**

Bi belavbûna vîrusê re her kesek li gorî zanîna xwe an jî li gorî pêşniyarên dedora xwe dixwaze xwe ji vîrusê biparêze. Bi rêya medyaya civakî û amûrên ragihandinê, kesên zanyar û ne zanyar jî gelek pêşniyarên malzemeyên paqijî û dezenfekteyê dikin. Lê belê gelek pêşniyar ji zanyariyê dûr in û dibin sedema xetereyên mezin ên tenduristiyê.

Pêşniyarên ji bo malzemeyên dezenfekte û paqijiyê tên kirin bû sedema mezinbûna sektora paqijiyê û ev yek jî tenê feydeyê da bazirganan. Di heman demê de jî daxwazî û pêşkeşî bû sedema buhabûna wan malzemeyan.

Niha bi milyonan kes li dijî vîrusê li malê dimînin. Ji bo paqijiya mal û paqijiya kesî hewl didin. Êdî fikara nexweşiya koronayê derketiye asta herî jor. Li malê gelek cureyên malzemeyên dezenfekte û paqijiyê tên bikaranîn. Ev tişt jî bi xwe re rîska jehrbûnê anî. Li gorî rapora Navenda Têkoşîna Li Dijî Nexweşiyan a Amerîkayê (CDC) ji çileyê heta adarê ji ber bikaranîna madeyên paqijiyê û jelên hîdroalkolîk ên paqijiyê li Amerîkayê 45 hezar û 550 kes jehrî bûne.

**Xweza û îzolasyon…**

Zêdebûn û mezinbûna santralên nukleerî, ceribandinên çekên nukleerî, şerên herêmî, ceribandinên radyoaktîf, mayînên materyalên radyoaktîf, febrîqayên mezin û agirên daristanan bûn sedema texrîbata xwezayê. Bi vîrusa koronayê re kriyarên mezin ên endustriyê hatin rawestandin. Ev tişt kêm be jî bandoreke erênî li ser xwezayê kir û bi pêvajoya karantînayê re jî xweza kêm be zindî bû.

Her wiha niha bi milyonan kes li malê kar dikin, enerjiya ku li kargeh û febrîqeyên mezin dihat xerçkirin kêm bû. Ev yek bi xwe tesarûfê anî û bû sedem ku santralên ceyranê zêde nexebitin.

Welatên bi pirsgirêka gemariya hewayê re rûbirû bûn bi vîrusê re hewa wan paqijtir bû. Ger û geşta bi rêya balafiran dihat kirin rawestiya. Her wiha di rojên karantînayê de jî bikaranîna maşîneyên ferdî ji sedî sed kêm bû. Vê bandor li hewayê kir. Li gorî daneyên Ajansa Feza û Hewayê ya Amerîkayê (NASA) li Çîn, New York, Îtalya û Hindistanê gemariya hewayê kêm bûye.

Li gorî daxuyaniya Ajansa Fezayê ya Ewropayê (ESA), qenalên Venedîka Îtalyayê yên li cîhanê bi nav û deng in, di dema karantînayê de paqij bûn û masiyên ji ber gemariyê xuya nedikirin, dîsa xuya bûn.

## Fitar û nimêja bi komî nayê kirin

Civata misilman meha Remezanê di pêvajoya vîrusa koronayê de pêşwazî dike. Ji ber vîrusa koronayê li welatên Rojhilata Navîn tedbîra mayîna li malê heye. Ji ber vê yekê di meha Remezanê de fitara bi hev re, nimêja komî û serdana bajarên ji bo îslamê pîroz in dê neyên kirin.

Li Erebistana Siûdî, Misir, Lubnan, Sûriye, Iraq, li Fasê û Tirkiyeyê meha Remezanê yekem car bi rengekî cuda hat pêşwazîkirin. Rayedarên Siûdî li dijî belavbûna vîrusê serdanên li Mekke û Medîneyê hefteya borî rawestandibûn. Her wiha hat diyar kirin ku serdanên hecê yên salane ku dawiya meha tîrmehê tên kirin îsal ji aliyê Erebistana Siûdî ve hat taloqkirin. Rayedarên Riyadê bang li misilmanan kir ku amadekariyên xwe yên serdana Mekkeyê taloq bikin.

Li gorî Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê, tedbîrên mayîna li malê çalakî asteng kiribe jî li pêşiya girtina rojiyê ya misilmanan ne asteng e. Lê belê pêşniyar li misilmanan kir ku guh bidin pêşniyarên doktor û zanyaran.



# Evdalê Zeynikê, yuzbaşiyê îngilîz û kolera



**Sedat Ulugana**

Surmelî Memed Paşa û Evdalê Zeynikê jî bi kolerayê dikevin. Çend meh şûn de Evdalê Zeynikê baş dibe lê Surmelî Memed Paşa ji ber vê nexweşiyê li wir dimire. Li gor Ahmed Aras, Surmelî Memed Paşa ji aliyê marekî dêm ve hatiye kuştin

Nexweşiyên perokî ne tenê pirsgirêkên serdema me ne, ji destpêka mirovahiyê heya roja îro bi çendan nexweşî li ser rûye erdê peyda bûne û bi milyonan mirov ji ber van nexweşiyan mirine. Helbet Kurdistan jî di herikandina dîrokê de ji van nexweşiyan bêpar nemaye. Bêtir nexweşiya kolerayê (kurdên hêla Serhedê jê re dibêjin “qolerek” an jî "hêtereş”) an jî ji çavqulke (veba) bi milyonan kurd kuştine. Alim û zanayên kurdan yên wek Îdrîsê Bitlîsê û Şêx Muhemedê Arwasî di serdemên xwe de li ser van nexweşiyan lêkolîn kirine û encamên van lêkolînan wek pirtûk jî çap kirine. (bawerim di alema îslamê de yê ku bi avayekî sîstematîk li ser nexweşiya çavqulke (veba) sekiniye û tedbîrên wek “karantîna” pêşniyar kiriye Îdrîsê Bitlîsî ye . (Risâletü’l-ibâ ʿan mevâḳıʿi’l-vebâ. Sal: 1512)

Di destpêka salên 1860'î de li Anatoliya û Kurdistanê careke din kolera belav dibe, dewletên Ewropayê dema vê xeberê dibihîzin bi dehan bijîşk û hekîmên xwe dişînin dewleta Osmanî, seva ku ew ji aliyê tendûristiyê ve alîkariya Osmaniyan bikin, lewma di van salan de tu bijîşk û hekîmên Osmanî ji termên wek “anatomî” , “otopsî” û “karantîna” tiştek fehm nedikir. Lewma dewletên Ewropayê hewl didan ku hekîm û bijîşkên Osmaniyan perwerde bikin û bi vî awayî bikaribin nexweşiyên perokî di erdnîgariya dewleta Osmanî de îzole bikin. Di van salan de , di bahara 1865'an de li çiyayê Sîsê (Xozan-Edene) eşîra Kozanoglu (li gor belgeyên rûsî yên ku ji aliyê Celîlê Celîl ve hatine dîtin Kozanogluyan xwe wek ‘eşîreke kurd’ didan nasîn) li hemberî dewleta Osmanî careke din serî radike. Êdî erka dewleta Osmanî nexweşiya kolerayê ji bîr ve dike, peyamberan dişîne her çar terefê dewletê û ji bo sefera li ser Kozanogluyan leşkeran berhev dike. Mîrê Kelha Topraqeleyê (gundê Elajgira Agiriyê) Surmelî Memed Paşa jî guh dide şandeya dewleta Osmanî û 400 şervanên bijare yên ji eşîrên derdorê berhev dike, her çiqas serokeşîr û dengbêjê paşê yê binav û deng Evdalê Zeynikê li hemberî vê mabesta paşê derdikevin jî, lê paşa tu kesî guhdar nake û Evdal jî bi xwe re dibe herêma şer, dema Surmelî Memed Paşa bi rê dikeve, lawê wî yê mezin, Evdila Beg bavê xwe hişyar dike ku ev hevok ji aliyê Evdalê Zeynikê ve wek kilam gihîştine roja me:

*Evdila Begê bi sê denga kire gazî,*
*Go Surmelî Memed Paşa bavo,*
*Wê hal û hewalê me çawa be?*
*Li kêleka me ya rastê eskerê Romê ye*
*Li pêşya me eskerê Hecî Ûsiv Paşayê Sîpikî,*
*Sofî Paşayê Hesenî, Temoyê Cibirî ye,*
*Li xana Çerkeza, bi me ra hûre hûre, gaze gaze,*
*Surmelî Memed Paşa digo Evdila Beg, lawo, tu bajo*
*Ez bavê te me, kilê çevê Eyşan Xanimê me*
*Ez xudanê şanzde eşîrê me, lawo tu bajo!*

Welhasil Surmelî Memed Paşa guh nade lawê xwe Evdila Begê û jina xwe Eyşan Xanimê, dide pêşiya şervanên eşîran û diçe herêma şer . Li wir şerekî çetin diqewime, eşîra Kozanoglu li ber xwe dide, bi sedan leşkerên Osmaniyan tên kuştin. Her wisa hozanê Kozanogluyan Dadaloglu li ser qehremaniya Kozanogluyan stranan dibêje. Di vî şerî de şervanên kurd jî li hemberî Kozanogluyan êrîşên serkeftî pêk tînin. Dengbêjê Surmelî Memed Paşa Evdalê Zeynikê jî li ser qehremaniya kurdan stranan dibêje (lê nizanim gelo ev her du dengbêj û hozanên efsanewî li wir rastî hev hatine yan na ). Çend meh şûn de nexweşiya kolerayê di nav leşkerên Osmanî û şervanên kurd de belav dibe. Şervanên kurd peyder pey dimirin. Her wiha Surmelî Memed Paşa û Evdalê Zeynikê jî bi kolerayê dikevin. Çend meh şûn de Evdalê Zeynikê baş dibe lê Surmelî Memed Paşa ji ber vê nexweşiyê li wir dimire. Li gor Ahmed Aras, Surmelî Memed Paşa ji aliyê marekî dêm ve hatiye kuştin. (Bnr: Ahmed Aras, Evdalê Zeynikê: Şairê Kurda yê Efsanewî. Nûbihar, Stenbol, 2018, lê li gorî arşîva Osmanî ew ji ber kolerayê canê xwe ji dest daye. Lê bi çi şiklî, di kîjan dîrokê de û li ku wefat kiriye ne dîyar e B.O.A. BEO .1263/94692-H. 24.9.1316) Evdalê Zeynikê di dawiya rêwitiyeke pir zor û zehmet de vedigere Serhedê. Piştî wefata Surmelî Memed Paşa, pozîsyona begtiya kelha Topreqeleyê vala dimîne, hemû eşîrên devdorê û malbata Surmelî Memed Paşa di wê hêviyê de ne ku begtiyê bidin lawê paşê yê mezin Evdila Beg. Lê dewleta Osmanî mîna wan nafîkire, firset ew firset e ji bo dewletê ku êdî ji aktorekî wek Surmelî Memed Beg xelas bûye. Dewlet çendekî şûn de, dewsa wî çerkezekî bi navê Omer Beg wek qaymeqam dişîne herêmê. Ev yek pir li zora eşîrên kurd û malbata paşê diçe. Lê nexweşiya kolerayê xelkê derdorê qir kiribûn, taqet di tu kesî de tinebû ku li hemberî Romê serî rake. Evdalê Zeynikê jî di van salan de kor dibe, xizan dikeve û bi destê Temoyê lawê xwe digire û gund bi gund digere.

Di van salên kolerayê de pisporekî îngilîz Captain Frederick Gustavus Burnaby û xizmetkarê wî Radford di sala 1876'an de tên Kurdistanê. Her çiqas pisporê îngilîz îdia dike ku ew tenê ji bo gereke tûrîstîk çûye vê mintiqê, lê di vegotina wî de diyar e ku ew ji bo peyvireke îstîxbaratî tevgeriyaye (her dem ji me re digotin ku di her terefê împaratoriyê de mesîhî dihatin kuştin). Yuzbaşî Burnaby di zivistana 1876'an de li Stenbol Uskudarê li hespê xwe siyar dibe û gund bi gund, bajar bi bajar digere, di Serheda Kurdistanê re derbas dibe û heya Batûmê diçe. Burnaby vê rêvitiya xwe salek şûn de, dema vedigere Brîtanyayê- wek 2 cild pirtûk jî çap dike (Captain Fred Burnaby , On Horseback Trough Asia Minor II, Gilbert and Rivington printers, London ,1877). Burnaby li nêzî Topreqeleyê , ji gundê Zêdxaneyê dema diçe gundê Molasilêmanê, di rê de rêberê wî yê ermen kelha Topreqeleyê nîşanê wî dide û dibêje ku “çend meh berê li vir trajediyek qewimiye” yanî di sala 1876'an de. Paşê Burnaby ji deve rêberê ermen behsa tirajediyê dike. Li gor gotina Burnaby , çar sal berê (di 1872'an de) qaymeqamê Topraqeleyeyê kurdek bûye (yanî kurê Surmelî Memed Paşa Evdila Beg).

Kalê wî qralê Bazîdê bûye. Malbat bi riya zewacê xwediyê çendan xizmên stenbolî yên di dewletê de bi bandor bûne. Lê bi dehan gilî hatine kirin di der barê qaymeqam de û dewletê peywira qaymeqamtiyê ji wî standiye û daye yekî çerkez. Ev sedem bûye mijara gengeşî û aloziyê di navbera rêvebirê berê û yê nû. Evdila Beg her tim aniye ziman dê ku rojekê ji çerkez heyfê vebike. Di van rojan de Surmelî Memed Paşa wefat kiriye û di heman demê de daweta ermenekî hebûye. Ermen diçe ji Evdila Begê îznê dixwaze ji bo ku di dawetê de def û zirne bên lêxistin. Dema def û zirne lê dixe, jina Surmelî Memed Paşa Eyşan Xanim derdikeve pêşiya lawê xwe Evdila Beg dibêje “ev çi bêedebî ye li taxa filehan di şîna bavê te de tê kirin!” Evdila Beg feremûş dibe û çend xulamên xwe dişîne taxa filehan da ku dengê def û zirnê û guleyan bidin sekinandin. Her wiha mirovên Evdila Begê diçin taxa filehan û dengê def û zirnê didin sekinandin. Li ser vê yeke ermeniyê xwediyê dawetê diçe bal qaymeqamê çerkez û şikayeta Evdila Beg dike. Qaymeqam jî dibêje “here daweta xwe bidomîne bila vê carê dengê def û zirnê bêtir xurt bibe ji cara din û li ber barûdê jî nekevin, heya ji destê we tê guleyan biteqînin, ka em dê bibînin qaymeqamê eslî kî ye?” Li ser van gotinên qaymeqamê çerkez, ermen vedigere malê û dawet careke din dest pê dike. Evdila Beg meseleyê fahm dike û birayên xwe hildide vê carê rasterast diçe koşka qaymeqamê çerkez û qeymeqam di odeya razanê de diqefilîne. Di navbera wan de şer dertê, di dawiya şer de Evdila Beg û tevî sê mirovên xwe tên kuştin. Qaymeqamê çerkez jî bi xeterî birîndar dibe. Burnaby dibêje li ser vê yekê kurdên hawirdorê ji çiyayan berhev dibin û dadikevin Topreqeleyê û sond dixwin ku heyfa Evdila Begê hildin. Çerkez jî li kelha Topreqeleyê dicivin û li hemberî erîşên kurdan haziriya xwe dikin. Lê Burnaby dibêje, ew mirovê ku ji min re ev bûyer got, siyarekî dişîne bal waliyê Bazîdê da ku pêşiya vî şerî bigire, walî jî leşker şandine Topreqeleyê da ku di navbera kurd û çerkezan de şer raweste. Wek wisa nebûya kurd û çerkezan dê koka hev biqelandana.

Li gor Ahmed Aras, “çend rojan piştî mirina Surmelî Memed Paşa (1865) li taxa çerkezan def û zirne lêdixe û şahiyek çêdibe.” Evdila Beg bi dilekî saf diçe bal çerkez Omer Beg û heya her dû tevê hev qehweyê jî vedixwin û jineke çerkez diçe gazî çerkezan dike, çerkez di hundur de êrîşê mêvanên xwe Evdila Begê dikin û wî bi bêbextî dikujîn. Her wiha dema mirov Burnaby û Aras berawird dike, nakokiyek derdikeve holê. Li gor Burnaby ev bûyer “çend meh berê” yanî di sala 1876'an de “li taxa filehan” qewimiye û Evdila Beg ne bi dilekî saf, bi mebesta şer avêtiye ser mala qaymeqamê çerkez. Yanî di navbera mirina Surmelî Memed Paşa û çêbûna şerê di navbera Evdila Beg û Qaymeqamê çerkez de 11 sal heye. Mixabin vê gavê li ber destên me zêde “dukumanên nivîskî” tunene ku em li ser vê mijarê qerarekê bidin, lê wek “soz û deng” ev bûyera dîrokî ji aliyê Evdalê Zeynikê ve wek kilam hatiye gotin û gihîştiye roja me :

*(…)*
*Kela Topreqelê bişewite wê li kef e*
*Qaza û qulinga li bintara kelê girtiye ref e*
*Kevirê dîwana Memed Paşa mermer e, tev sedef e*
*Evdila Begê digo Eyşan dayê ev sê roj e bavê min miriye*
*Li taxa çerkezan nizanim ev çi zurne ye, çi def e*
*Ez ê herim dîwana Çerkez Omer jê ra bêjim ev ji te ra ne şeref e*
*(…)*
*Evdila Beg û Çerkez Omer li dîwanê rûniştî ne*
*Evdila Beg dibê yeqîn Çerkez Omer vê dewetê biterkîne*
*Ji dîwanê derdikeve êrbeteke giran bi çavê xwe dibîne*
*Bîst mêrê çerkeza li ser serê Teyar û Dilo qema dihejîne*
*Evdila Beg dibê, dême Çerkez Omer mi li vira dixapîne*
*Evdila Beg vedigere , destê xwe li tûncika Çerkez Omer dişidîne*
*Çerkez Omer davêje ber qema, serê wî ji gewdê diqetîne*
*(…)*
*Kela Topreqelê bişewite li hember e*
*Evdila Begê ji dîwanê derket der e*
*Qema Huseynê Çerkez hinde gir e*
*Ewqas dirêj e ewqas jî bi ber e*
*Qeme tûj e mîna jehra mer e*
*Qemek avête Evdila Begê, pir xedar e*
*(…)*
*Heyla wayê heyla wayê*
*Wey felekê wey dinyayê*

Di wan rojên ku Evdalê Zeynikê dest pê kiribû êdî ev kilama digot, Burnaby jî li ser pişta hespê xwe ber bi Wanê ve diçû. Nêzî Topreqeleyê di berfê de asê mabû û ji ber bagerê xwe avêtibû gundekî kurdan. Mala ku lê bûbû mêvan, mala axayê gund bû û keça axa ya bedew bala Burnaby kişandibû. Kî dizane, belkî ew keçik ji wan “bedewan” bû ku Evdal li ser wan kilam digot. Welhasil, bavê “keçika bedew” xortên gund li hespan siyar dike û xort didin pêşiya Burnaby; vî şiklî rê vedikin û Burnaby êdî bi aramî xwe digihîne Wanê. Burnaby çend rojan li Wanê dimîne û di vegerê de di Patnosê re derbas dibe û ber bi bakur, heya “gundê Zulfu Livaneli” (navê Artvînê di van salan de “Livane” bû û nişteciyên wê ji kurdan, ermen û gurciyan pêk dihat) diçe û piştî du rojan xwe digihîne lîmana Batûmê û bihara 1977'an bi keştiyê vedigere Stenbolê.


Evdalê Zeynikê


Captain Fred Burnaby

# Ciwîyayîş, emeg û mekan

O wo ke sarrî rê rameno, sarrî rê çîneno; roze yena ke vergî ra vêsan, morrî ra viran maneno.O wo ke sarrî rê rameno, sarrî rê çîneno; roze yena ke vergî ra vêsan, morrî ra viran maneno. Ciwîyayîş û emeg têwerte de rê. Emeg û ci rê wayîr vejiyayene zaf muhîm a…

Meral Ozel

**Qesê Pîlan**

Metropolî, sûke ke mordem tey xenekîno roza ma yê ewroyîni de jê cayê şaristanîye, jê cayê însonê modern yenê misnayene. Raştîya metropolanê pîlan, sûkanê pîlan zovînaya. Ya kî însone modern çi turî yo? Mana "modern bîyayene" çik a? Ya kî çekûya "mordern" çik a? Nê pêro persî… Hama ma ser ciwîyayîş, emeg û mekanî de vinderîme.

Ciwîyayîş û emeg têwerte de rê. Emeg û ci rê wayîr vejiyayene zaf muhîm a. Eke emegî rê wayîr nêame vejîyayene, mordem raya kole bîyayene ke o waxt rakeno. Dînaya ewroyîne de dismenê emegê mordemî zaf î. Sernî de ke kapîtalîzme. Kapîtalîzm, bi raya aborîya en jede însonî ser zor kena. Kapîtalîzme dismenê înson a, dismenê emeg a, dismenê feqiran a, dismenê dewizan a. Roza ke ciwîyayîs dest ci kerdo heta roza ewroyîne însonî bi rayanê cîya cîya dabara xo ardê. Gorê namê kerdena demê nikayîn ekonomî bi ray û olaxanê gorê civatan rayî ra amo berdene. Hama ewro sîstema kapîtalîzme ekonomî, gorê xo name kerdo û naye ser o ke civate ser zor kena. Gorê vatena heremî; tayê wenê, tayê mirenê. No kî yeno no mana; hukumdarî, wayîrê şîrketanê pîlan wenê, emegdarî, karkerî ke mirenê.

Vatisê aborî, serva nê dormeyan her çi destê xo de pê guretene, jedena qezenç kerdene û naye kes de bare nêkerdena. Virende însonî mavenê xo de kar bare kerdo, werdis bare kerdo, seweta jedena qezenç talan nêkerdî dîna. Kes kesî ser ra hukumdarîya xo hetê aborîye ra ferz nêkerdo. Onca zerrê civate de kesî ke emeg da, kesî ke gurîya înan rê hûrmet amo misnayene. Dem şîyo demî ser dewizî ke bîyê lete nê kulturî. Nika dîna vûrîya, no kultur kî xo ra pîya vûrna. Mezgê însonan jûbîn ser o tesîr kerd. Zonayîsê jedena qezenç kerdene her ke şî mavenê cîvate de bî bingê cîyabîyayîşî. Kolekerdena însonî eynî demî de kolekerdena emegê însonî ya.

Kolekerdena însonî de mekan kî cayêdo muhîm o. Rolê metropolan û sûkan naye de zaf pîl o. Demo ke game erzenê sûkan tax bi tax, gucik bi gucik raştîya însonan yena ra verê çiman. Sûkan de ciwîyayîşê şarî gorê sisteman o. Hama raştîye de tayê jê kole gurenê, tim bi vesanîya têriye, jû hetî bîn de kî dewlemendî ke her çî destê înan de ro estî.

Serran ra avê waxte jû meymanîye de jû naskerdox qeseyî de rind vatîbî: Ma kî dewan de honde seat nîya biguriyenê, dewê ma bîyenê şen. Nika xerîviye de, binê destî de hîn guremê, qeyta veng xo ra nêvezemê. Lej, pêrodayîş, qirkerdene ra qeyir mordem çinay rê dewa xo ra dur kûno? Serva sûkan çinay rê honde canda nê û çinay rê nika gencî nêwazenê dewan de biciwîyê?

Hondê dewî tolî yê kî dewan de kokimî mendî, beşe nêkenê jê viren tewa bikerî. Honde hegayî cer ra cor tolî. Gencî ke palkayan ra heta karanê înşatî jê kole gurenê, çinay rê merê têhet, çinay rê nê hardan pîya bi kooperatîfan wê mekerî, çinay rê jûbînî rê poştdayena dewanê xo de newe ra ciwîyayîş gewe mekerî.


Virende dewizî hegayanê xo gorê xo ramitene. Hawa ra hata awe, xoza, deyrûdur zerar nêdîyenê. Her serrî gorê xo no çarx çaraxîya. Her kes zerrê hegayê xo de bî, onca kesî ke çiti ra rind fam kerdêne înan ra kî yardim guretêne. No dem nîya verdenê. Çiyê en muhîm ke werdiso ke nê hegayan ra vejêyenê weşîya kesî rê zerar nêdenê. Serrê ke şî sere ser hegayî nêameyên ramitene, vatêne wele tenê bêro ra xo ser. Dewizî zonene ke, mordem wela xo rê, xoza rê çi tur nejdî bî, xoza kî hîn nejdî bena. Serrê hardî de royê her çî esto.

Hardê ma, hegayê ma, dewê ma xeleşîyayîş î. Dewan de çixaş gurenayîs bî, emeg bî ma kî honde qiymetîn beme. Hîn mebo heta kewt çeberê palkayan de, xerîvîye de binê destan de gureno mordem. Peynîya na çarx nîna. Coka kesî ke hona raya dewanê xo xo vîrî ra nêkerdê peyser racerî, hardê xo rê wayir bivejî, kesî ke cayê xo esto, dewanê xo cirananê xo rê rakerî.

Metropolanê koleyanê modern înan rê caverderî, çarxê înan nêçaraxî yo. Emeg, sima rê bimano, gegane jibayîs, berbayîs kî esto, hama onca ke welatê mordemî, qomê mordemî, wela mordemî ra qeyîr dermanê mordemî çîn o.



# Çirtika sorbêlaxî (2) Gimgim ra hetanî uskira



Mehmet Seyîtalîoglu

Çirtika Sorbêlaxî ra awe herekîna…

Dero derxura ra, usar bi usar gima, gima awana.

Gimgim ra hetê rojawanî ser kewta ray, çend kilometrî werda ra hetanî Uskira çem û dera ra derbaz bena. Dewa Tâçîye û Dewa Qêrqerûtê mîyan de awa Goşkarî herkîna. Warane Reqasa ra dere Gazerînê kî dewa Rêqasa corenê û waranê Kortara xo cenade şona. Dewa Segire û dewa Muzûra mîyan de resenê awa Goşkarî. Awa Goşkar Bavay koye Bîngolî ra eyna. Le na awe zimistanî zede vore varêna. No çem xo awa vore ra ceno de. Na awa na vore kena weyî. Usar bi usar behemd bena zede. Usarî çemê Goşkarî çi xo verfîyo hetanî çemê Susî beno. Çemê Goşkarî û awa dere çemê Susî kuna têmya. Dewa Alingoza Corî awe bena çemede girs. Na awe şona resena awa Sîyaye û a kî şona bena Murad.

Rêqasa ra ke werda ra dere Banî est o. Nîna ra awe şeredîna. Ebe na awe hegaya û merga awe danî. Awa ke zede mende şona resena derê Gulîcîyê. Tabîat xo henî rind kerdo program ke, qet qalê ey meke. Deme zergunîya merga û hêgayan qedyî, tabîat heyderê û heşare cî yo. Awî bena kemî. Le rayştîye kî henêna. Awe endî zêde lazim nîya. Payizî waxtê cit û cobara na awe kâfî ena.

Awa dere Banî, waranê Korta ra kolo ju xelesina ra. Hetê dewa Sofya ser eno û dere Banî ra derbaz bena. Kolo bîn kî, hetê dewa Segire ser şono. Kuno awa goşkarî mîyan.

Hîkmetê pîle Goşkarî de ra, gelîya Goşkar Bavay de ra. Na awe nemey xo dewe ra cena. Dewe nemey xo Goşkar Bavay ra cena. Goşkar Bava û dewa Goşkarî ju namê yo. Na bîye e juyîne.

**A e didîne çika?**

Gelîya Goşkar Bavay de zaf nebatî estê. Namey nebata ma cer rezekîme. Le şarî no otantîq heyatê xo de ebe hazaran ser ra ke kerdo rewşa bîyayişa. Camêr da niçîr dime şîyenê, cînya der û dore xo de nebatî top kerde. No tore hona honakî kultirê ma de caye xo est o. Xo vîra neker do.

Gelîya Goşkarî de amey tay nebata; So, poxik, heliz, mendike, helige, kenger, gelêzan, kenger nebî, gurnîge, nerebend, dirike, marşinge, pejeke, pune, dîndarokê, punge, nonê çuçka, gul sosine, tirşike, kardun, pîçoke, sung, ribes, anux, berberoj, pel hewes, qîje, jajik, xaşxaşikî ûsn.


Usarî turik eyştne herme xo, cinî, camerd û zaw û zêç kewtêne Gelîya Goşkarî. Ne waşa û nebata zafîne dane are. Tayede xo potê werdenê. Tayede xo kî seba zimistanî kerdenê huşk. Zimistanî ebe kef ardene sifre ser. Weş-weş werdenê.

Dewa Goşkarî geçimê xo ebe malo hurdî bî. Koyê Goşkarî Bavay, Gêlîya Goşkar Bavay merg û gul û sosina ra xêmelîyayîya bî. Warane Goşkarî de usarî varekî û malo meşîn mergîza de çeng denê çerêne, benê bîyenê xurt. Hîre çar aşman de varkî bîyenê sey beran. Koça kene girs. Payizî dewa Goşkarî varekane xo tim fîyato ebe fîyato berz rotêne.

Goşkar Bava zîyareta. Na zîyarete ra zafîne şarî pe mirade xo dîyo. Eke ebe zerro hayşt nêt o pak şore na zîyar ser, hetanî nika kes bemirad neverdo. Dewane der û dorma seba mirade xo na zîyare nîyaz kene. Zîyarete sero lokme kene vila.

Gelîya Goşkarî pirê male hêqî yo. Zimistanî wore çaw û çawkanî nimitî te, no mal vêşan manen o. Ne pezkuwî amynê dewe mîyan. Şîyene danga meşnan ebe vaş pîze xo kerd mird. Şan ra şanitê ci şîyenê gelîya Goşkarî.

Zîyareta Goşkarî, şaro ke zerre pak o, çi mirad vayştene, amene ca…






# Navê te çi ye?

Zilamek di rê de dimeşe dibîne zarokekî biçûk li ber deriyê hewşa xwe ye. Mêrik li zarok dinêre zarokekî biçûk yê 4-5 salî ye, zarokekî gelekî xwînşêrîn û rû li ken e. Mêrik jê re dibêje: Navê te çi ye zarokê delal. Beriya ku zarok bersivê bide wî dibêje ka bisekine ez ê navê te texmîn bikim.


Ka tenê tu herfa pêşî ya ji navê xwe bêje û ez ê navê te texmîn bikim. Zarok dibêje Y. Zilam dibêje wê gavê navê te Yusif e. Zarok dibêje na. Mêrik dibêje Yunis e, Yahya ye, Yilmaz e û hema bêje çi navên bi Y'yê dest pê dikin dijmêre her bersiva kurik dîsa na ye. Dawî mêrik êdî aciz dibe û dibêje tamam min tê dernexist ka tu bêje navê te çi ye.

Lawik dibêje navê min Yemezan e. Tu nabêjî hîna zarok nizane herfa R'yê bi lêv bike û li şûna R'yê dibêje Y. Lê henek li aliyekî min behsa çîroka navê Remezan kir meha remezanê hat bîra min.

Bi xêr û xweşî be vaye rojiya meha remezanê jî dest pê kir. Îca em mane heyirî doktor ji bo parastina ji koronayê dibêjin gerek her kêliyekê hûn avê vexwin ji bo gewriya we zuha nebe îca em ê çawa rojî bigirin û çawa qewriya xwe şil bihêlin. Îca nizanim dê saziya oldariyê çi biryarê di vê der barê de bide. Hûn çi dibêjin gelo ez rojî bigirim an negirim?



# XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

3 - Arvan. 5 - Kul û derd. 7 - Welatekî islamî bi darvekirinê navdar e. 8 - Cînavkek pirhejmar. 9 - Sebir, deyax. 13 - Ferman. 14 - Pêxemberek. 16 - Paşnavê helbestvaneke kurd. 19 - Qumaşê didin ber paceyan. 20 - Kesa hevserê wê dimire. 21 - Sewaleke barhilgir. 22 - Xwarina êvarê. 25 - Daçekek. 26 - Qismet, çarenivîs. 28 - Ne razayî.


**JI JOR BER BI JÊR**

1 - Serkêşê şoreşeke kurdan. 2 - Weke. 3 - Hunermendekî kurdistanî yê ermen. 4 - Wext. 6 - Gundekî Xelfetiyê yê navdar. 10 - Al, sembol. 11 - Vîn. 12 - Cebhe, qada şer. 15 - Pirça mî û berxan. 17 - Melek, horî. 18 - Fêkiyekî havînê yê li Kurdistanê herî navdar . 20 - Qedeh. 23 - Derew. 24 - Şînkahiya zebeş û petêxan digire. 27 - Noteyeke muzîkê.

**Bersiva hefteya borî**



## Ronahiya Rojê



Berfîn Dijle

# Li benda rihma koronayê

Zanyarên derûnnasiyê dibêjin: Di van rojên koronayê de, di hundirê malê de be jî têkiliyên xwe ji kesî nebrin, xwe ji heval û hogirên xwe dûr nekin, li wan bigerin, bila bêhna we derkeve…

Eyşan, çawa vê şîretê ji televîzyonê bihîst, rakir telefonê û li çend nas û dostên xwe geriya. Yek ji wan bûka mala Qado bû ku ji roja zewicî bû vir de piyê xwe nedabû ber xwe û li mal rûneniştibû.

Xwebixwe got: "Min çavê koronayê xwarê, bi xezeba xwe, me tevan kir wekhev û hişt. Niha vê ya di mal de genî bûye. De jin e bila di van rojan de jî quretiyê bike!"

Û deng li bûka mala Qado da!

-Elooo Nazlîxan çawanî xwişka min. Bi xwedê min bêriya te kiriye! Îro çend roj in tu ji bîra min naçî!

-Hîî Eyşan!!! Tu yî qurbanê! Ka telefona xwe bigire bigire, ez li te bigerim. Bila konturên te neçin. Tu guneh î xwişka min. Miaşê mêrê te bi zorê têrî nanê we yê zuha bike.

Wekî taseke ava sar bi serê Nazlîxanê de dakin, çokên wê sist bûn û xwe da ser koltixê. Telefona wê lêket.

-Elooo! Eyşan! De ka bêje xwişka min, hun çi dikin, çawa nin? Xwedê bikim Hesenê mêrê te ji îş neavêtibin. Kemê hûn ê çi bixwin çi li xwe xin? Belê em ji malê dernakevin lê hûr li me bûye gur, em dixwin û naxwin wî têr nakin. Hema çend deqe bi ser da bikeve, li me dike zûrezûr.

Eyb nebe Selîmo çû sûkê mesrefa malê kir, bi wê qurana ku bavê min û te xwendine, hema sê çar hezarî li ser mitbexê daye. Di heftiyekê de tev qediyan, niha dîsa çûye mesrefê bike. Ditirsim li sûkê bi koronayê bikeve. Lê baş e ku me lepikên hîjyenîk û maskeyên cerrahî bi dest xistin. Wan li xwe kir û hê ji malê derket.

Wekî tu zanî bihar e, bexçê me şîn bûye, xemilye, gul û sosinên me tev vekirine. Geh em dertên şaneşîna havînê geh em dertên bexçe. Me her sê taximê masê xwe avêtiye derve û em bi wî awayî bêhna xwe derdixin.

Eyşan, de ka bêje xwişka min! Ez reben im, xesî û xezûr jî di sitiyê te de ne. Niha hûn di hindur de hevdu dixwin kemê.

Bêhn li Eyşana min û we çikiya. Ne got him, ne got gim û telefona xwe girt û şûşa avê bi ser devê xwe de dakir!

Eyşanê piştî mehekê êdî hew xwe ragirt û dev û pozê xwe girt şûnde rakir ereboka xwe ya danûstendinê û xwe avêt erasê.

Bi tirs û xof bû. Hê siba zûbû û tenê kûçik li derdorê bûn. Belê erase xewle ye lê bi fikirîna gelo zerzewat biha ne an ne biha ne, moralê wê xera bû. Di ser berdevkê de wekî qaçaxçiyên ku li ber xetê bin, li benda teqîna mayinên koronayê bû. Bi lez çend lazmantiyan kirî û ket rêya malê.

Zarokan dabû pey kûçikan. Çima hewtînî bi wan neket. Tirsa kûçikan da ser tirsa koronayê. Eyşanê xwe li hev şaş kir, dest û lingên wê li hev geriyan. Tevî ereboka xwe li kevirên peyarêyê ket. Sola wê qetiya, erebok ji hev ket û bela wela bû.

Firingî li alîkî gêr bûn, leymon li alîkî. BMW'yek ji wî alî de hat, di ber de derbas bû, firingî û leymon di bin tekerên wê de eciqîn. Eyşanê kelogirî bû. Nizanibû li ber firingî û leymonan keve ne ku li ber derketina xwe ya nav koronayê keve. Di eynika erebê de çav bi Nazlixana Mala Qado ket! Rabû ser xwe. Ereboka xwe da hev, av bi dev û pozê wê ket. Li ber dilê xwe da û got:

Nalet bê li wê edaleta ku xweda neda be û em ji bo wekheviyê, li benda rihma koronayê ne!


# Antolojîyeke kêmnas

Ferec Koyistanî


Antolojî, bi kurt û kurmancî navê wê berhevoka edebî ye ku ji metinên bijare yên helbest, çîrok û hwd hatiye pê. Çend bergindên wê yên kurdî yên ku di Ferhenga WQ'yê de cih digirin, wiha ne: "Gulbijêrk, berhevok, danhevok, kom, deste, destegul" û hwd. Ji ber mehrûmiya kurdî ya ji dîrokeke tekûz a edebî û ji ber pirbûna zarava û emelpêkirina kurdan a bi alfabeyine nejihev, weke gelek çeşnên dîtir, mirov bi rehetî naşê wêneyê bîbliyografiya antolojiyên kurdî jî bigire. Ji nav bergindên antolojiyê yên ku min li jorê bi xêra ferhenga WQ'yê rêz kirin, "gulbijêrk, guldeste" -û 'destegul'a ku bi her duyan re hevwate ye- bi însên estetîtiktir xuya dikin. Weke negirtina me ya bi rehetî ya wêneyê bîbliyografiya antolojiyên kurdî, em ê bi rehetî nikaribin bê ka cara ewil kê bi van "gul"an bergindek bo bêjeya antolojiyê dariştiye; lê gava ku mirov bi serê bêvilan awirekê di dîroka antolojiyê vedide, dibîne ku têkiliya van bergindên gulgulî bi berhema antolojiyê ya ewil re heye.

Edebîyata yewnanî, bo van kitêbên ku mirov bi xwendina wan gelek metin û nivîskarên rengorengo keşif dike, maktî kiriye. Stephanosa Meleagrosê Gadarayî û Fîlîpposê makedonyayî ku di destpêka sedsala 1'mîn a B.Z'yê de hatiye berhevkirin, weke antolojiya ewil tê hesibandin. Tevî helbestên Platon, Arkîlokos, Sîmonîdes û Safo, 37 helbestkaran di Stephanosê de cih girtiye. Pirtûk, bi helbesteke ku her 37 helbestkar tê de tên danasîn dest pê dike û helbestkarên ku tê de cih digirin, li gorî herfa pêşîn a risteyên ewil ên helbestên xwe bi awayekî alfabetîk hatine rêzkirin û her 37 nav jî bi kulîlkeke ku li kesayetê tê, hatiye sembolîzekirin. Stephanos, bi kurdî tê maneya "qewze" yan jî 'tacegul'ê. Herweha gava ku mirov li etîmolojiya bêjeya antolojiyê jî dinêre, ku ji peyva "anthos" (kulîlk) û ji lêkera "legein" (berhevkirin)ê pêk hatiye; dibîne yên ku cara ewilî bi van "gul"an ev bergindên estetîk dariştine, serwext û beledê çîroka kitêba ewil a antolojiyê bûye ku mirov bi xwendina wan, ji 'xwendin'ekê pirtir û zêdetir dixwîne.

Ji ber pirbûna zaravayên kurdî û emelpêkirina me ya bi alfabeyine nejihev, em gelek nivîskaran ji antolojiyan keşif dikin. Antolojiya ku ez van rojan dixwînim û ji helbestên tê de bêhna "nêrgiz"an dikim: Antolojiya Helbesta Nû Ya Kurmancên Başûr e ku Xelîl Duhokî amade kiriye. Ev antolojî, cara pêşîn bi navê "Helbesta Hevçerx Ya Kurdî " weke sê cildan di navbera 1992-1994- 1995'an de li Swêdê çap bûye. Çapa wê ya duyem di 2007'an de li Amedê ji nav Weşanên Dengê derketiye û herî dawîn di 2013'an de bi çapa xwe ya berfireh û bi navê xwe yê nû, li Stenbolê ji Weşanxaneya Berbangê derketiye. Berhem bi tevahî 784 rûpel e; tê de 81 helbestkar cih digirin, 9 jê jin in, 72 jî mêr in û piraniya wan helbestkaran di nîveka sedsala 20'an a duyem de ji dayik bûne. Di dawiya berhemê de ferhengokeke ku ji 13 rûpelan pêk tê, heye. Hebûna ferhengokê ji bo me bakuriyên ji form û bêjeyên devoka behdînî biyan, lêfikirîneke baş e. Lê belê mîzanpaja berhemê ne baş e û nivîsandina navên helbestkaran a li jora her rûpelî asta kalîteya weşanxaneyê diyar kiriye. Herweha, du dîtbariyine din ên ku ji berhemê bi ber çavên mirov dikevin û îhtîmal e xwîner pê aciz bibin: Nivîsandina helbestan a bi awayê stûr û reklama pirtûkên weşangêr a li rûpelên berhemê yên dawîn e. Helbet ji bo 'qumaşê me yê bêxerîdar' divê reklam her hebe û normal e ku weşanxaneyek li çend rûpelên kitêbekê yên dawîn reklama kitêbên xwe yên din jî bike. Îcar gava ku weşangerek, kitêbên xwe yên ku ji weşanxaneyên cuda derketine jî li vê reklamê zêde bike, wê ji eyarê derxe û neheqiyê li wê berhemê bike. Bi vê reklama weşangêr, ez wekî xwînerekî his dikim ku neheqî li vê berhemê hatiye kirin. Lê tevî hemû kêmasiyên wê yên teknîkî jî Antolojiya Helbesta Nû Ya Kurmancên Başûr ji bo naskirina helbesta modern a kurmanciya başûr ku gelekî helbestên tê de di asta cîhanê de ne û bi hêmayên xwe yên ji edebiyata cîhanê mirov hijmekar û serfiraz dikin, li benda xwînerên xwe ye ku kedîbûna bi destên koronoyê jî dê ji wan re bibe keys û xweş bahane.




**Têbinîyeke dûrî adetê: Ev nivîs bi handana meta min Laleşa Ûsiv li klavyeyê ket.**



Weswese 2

Şener Ozmen

## Bindarûk


Kafka di rojnivîska xwe de nivîsiye ku jiyan, wekî xewnekê ye. "*Lê*," dibêje Guattari û benik di guhê me re dike di nivîsara xwe de, "*ev nayê wê wateyê ku Kafka bi misînê vala çûye destmêjê, bi gotineke din xwe berî nav xewn û xeyalan daye.*"[1] Heye ku li ser topa dinyayê ti nivîskarek, temet Kafkayî, em bi derfetên xwendineke sermedî sermest nekirine, ku di heman demê de em bêgav hiştine wekî çendîn û çend sal in, em ên belengaz, mekîneya wî ya ku ji aşopîniya wî ya nîgaşî (*imaginaire onirique*) pêk hatiye, dixwazin ji hev bikin. Ne biqasî wesweseyên Bob Lazarê teorîzanê dek û dolaban bin jî, yê ku dar di qula mozan re dikir û feqîrên wekî min jî bi angaştên xwe yên seyr dixapand wekî di destê Artêşa Amerîkayê de teknolojiyeke derî cîhanê (Lazar qala reaktora keştiyeke fezayîyan dike, ku di hundirê xwe de dijbûjen jî dihewand) heye û ji mêj ve ye ku li ser dixebitin, da ku endezyariyeke berovajî pêk bînin, çi ka çi ye û bi çi û çi hatiye çêkirin, em jî bi dilxişîşî ra nêzîkî mekîneyê dibin û nikarin ji nav derkevin. Heke Kafka di xewn û xeyalan de jiya be, di heman demê de wekî ku dinivîsand jî xeyal dikir, di vir de Guattari berê me dide xewnên Kafkayî, ên ku seraqet gilî û gazinc ji wan dikir û digot; "Şevên ku bi xewnên delodîn roda diçin", lêbelê, piştî Freudî xewn jî, tew nîgaşa xewnê jî, bi şirovebariyeke delodîntir li me vegeriya; ango bi derfetên nû yên nivîsandinê!


Îhtimala ku Kafka aferîdeyekî fezayî be û ji gersitêrkeke ku tevayiya celebê wî, nivîskarên nola wî bin, bi şaşitî hatibe û li wêjeya cîhanê (yan cîhana wêjeyê) qesidî be, ji sedî yek be, îhtimala ku nivîskareke/î kurd ji derveyî alegoriya ku digel wê jî dayika xwe dibe, tiştekî binivîsîne jî, ji sedî 000000.1 jî nîne. Lewre "kurd" û "êş"hevtayên hev in. Ji ber hindê êş û nîgaşa êşê, derfeta afirandina tiştekî din nade destê wan, nedaye jî! Nivîskarê kurd ji bo mekîneya xwe saz bike, divê ji serê serî de êşa xwe, êşa ku bûye nasnameya wî, destnîşan bike û ev êş, di '*Bindarûk*'a[2] Mem Zînistanî de dibe birakujî, a ku çîroka mîtolojîk a Emeş û Enten (Lahar û Aşnan yan Habîl û Kabîl)[3] bi bîra me tîne, ango mêrkujiya ewilîn!

Navê çîroka ku di navbera salên 2007 û 2013'an de, li Bolû, Êlih û Bayîzdê hatiye nivîsîn ku devîdevî heft sal dom kiriye, Ayeta Sî û Sêyem e û bi êşeke din a nasyar dest pê dike; ew jî, Dayikên Şemiyê ne. Derhêner Zînistanî, di rojeke înê ya payîzeke berwext de, berê kameraya xwe (helbet kamerayeke Xwedayî ye ev) dide goristana mezin a Bayîzdê û encama mêrkujiyeke ku daw û doza qutkirina reh û rîşeyên vî gelî dikir, nîşanî me dide. "*Belam*," dibêje Barthes, "*ti nivîskar, heya ku ji xweristîtiyê bi dûr nekeve, dê nikaribe azadiya xwe tevlî resenatiya xwe bike*…" (Nivîs û Şîrove / Yazı ve Yorum, R. Barthes, 1990), Zînistanî, di çîroka di pey de jî guh nadêre dilê xwe, rasttirê, wekî Kafka, li dû xewna xwe nakeve û a soxîn, mirinê, vê carê bi bombeyeke ku li çolê hatiye dîtin, li bejna çîrokê dike; "…*ji ber ku pêrar van çaxan ji çar kuran kurekî wê û kur û qîzeke tîyê wê di qezayekê de miribûn.*" (Bindarûk, r.23). Pirsên ku min dixwest li jor bikim ev bûn; aya pêwîst in (naçarbûn) çi bi azadiya ku nivîskêr dixwaze, dike, yekê jî, gelo azadiya nivîskêr heya bi ku derê ye? Bersiva pirsa yekem; bi yê/ya neçakkirinbar re (*irreperable, Derrida*)[4] têkildar e, bi gotineke din bi yê/ya ku nacebire re û Zînistanî, di herdu çîrokan de jî, bi aşopiyeke ku ji bêgaviyê vezayiye, tevgeriyaye. Heke dibêjim (bi fîtkirina şîroveyên pirole), em di çîroka yekem de (*Ayeta Sî û Sêyem*), bi boneya mirineke asayî di deriyê wê goristanê re derbasbûna, Hesen û Huseyn bi dendikên xwe vegeriyana malê (ku rê pê ve seba tiştinan bi pev biçandana jî ne xem bû), heke dibêjim di çîroka duwem de (*Bindarûk*) çar jinên navsere li ser kevirên li fêza zomeyê, ango li wê bindarûkê, xwe bi gilîgotinên xwe ên bêperde egle bikirana û ji xwe re têr têr bikeniyana, salixên teqemeniyê neketa nav giliyan, dê çi bûbûya? "*Hebûn, ne goriyê xerabiyê ye, lê heke jê bê, divê xwe di nav sînorên aqilî de bigire*…" dibêje George Bataille di Edebiyat û Xerabiyê de, lewre Mem Zînistanî, şahidê xerabiyekê ye, a ku bi aqilê modernîst serederî ji vê yekê re nake, yan nema dikare bike. Bersiva pirsa duwem jî, ya ku nîşaneyên azadiya nivîskêr a rêxistinbar (a ku di vê civakê de tê edilandin) şanî me dide, di çîroka Jana Çargoşe û Mêrê Diya Min (*Çîrokeke Bêperde*) de derdikeve mexderê, Zînistanî, nêka pênivîska xwe di hibirdanka vegotineke teatral re dike, a ku divê em ji dramayê û rê û dirbên wê vebiqetînin. Ya rast, bi van çîrokan ji me dixwaze wekî em teatraliya di bendê de, berawirdî performansa ku li ser dikê tê lidarxistin, nekin, lewre, ev herdu cureyên mîmesîsê, xwediyê xwe û saw û sepeteke ciyawaz in. Bi tevî ku Zînistanî hewil daye wekî di navbera kesayetên çîrokê û temaşevanan de (lê em xwîner in) pêwendiyeke hestiyarî a rasterast, saz bike jî, ji ber kêşeya mîmesîsê, car caran bi paş de vekişiyaye û ev jî, tiştekî gelekî asayî ye.

Ji ber hindê, wekî Tennessee Williamsê ku yek ji girîngtirîn şanonivîsê sedsala çûyî bû, ji dekorkêr re têbiniyan dinivîsîne; "*Gundekî gewreboz î dûr î dereke… ji zû de ye li goristana şaristaniyê bê selewat û bê zîyaret maye*…" (Jana Çargoşe, r.30), yan jî; "*Jûreke nexweşxaneyekê… Ronahiyeke zer û qels jûrê ronî dike*…" (Mêrê Diya Min, r.93). De baş e azadî? Gelo em dikarin bibêjin wekî ew jî bi vehûnanê hatiye? Çûnkî di van çîrokên navborî de êdî em xwe di qada remz û kodan de dibînin, ma ne çîroknûs jî daxwaza vê yekê ji me dikir? Sînorên azadiya nivîskêr, bivênevê bi semîyolojiyê fireh dibe. Kafka bû yê ku digot; "*Her tişt şano bû, carinan ez li jor, li galeriyê bûm carinan jî min xwe li ser dikê didît [... ] dekor ewqas mezin bû ku, ne dik, ne hêwana temaşevanan, ne tarî û ne jî ronahiya rampê dihate dîtin.*" Bê vê yekê xwîner jî, rêwitiyeke navbendî (intertextaul) û navnifşî dike, lewre Kurdistan, mîna xewna Kafkayî, lap î mezin û êştije ye.

Têbîniyek: Duwemîn pirtûka Mem Zînistanî Heşterxan e, heya vêga we nexwendibe, tam wext e!




***[1]Şêst û Pênc Xewnên Franz Kafka (Franz Kafka'nın Altmış Beş Düşü), Felix Guattari, Ji Fransî: Murat Erşen, Monokl, 2012.***

***[2]Bindarûk, Mem Zînistanî, Lîs, 2015.***

***[3]"Bêhna barûdê di firnikên wî re, ku ji tirsan firehtir bûbûn, daxilî hinavên wî bû. Çîroka Habîl û Kabîl di fona banga 'eşayê de çendbare dibû, hey Xwedê dizanîbû."Ayeta Sî û Sêyem, r. 17, Bindarûk, M. Zînistanî.***

***[4]Sedema yekan, yê/ya neçakkirinbar, Chirac, vê peyvê, di nivîsareke xwe de, ji bo wesfandina cirmên ku di hikûmeta Vichyyê de li hemberî Cihûyan hatine kirin, bi kar aniye. (Bexişandin / Bağışlamak, Jacques Derrida, Monokl, 2015).***

xwebûn

27 Nîsan-3 Gulan 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 19

***İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:*** Kadri Esen
***Sorumlu Yazışleri Müdürü:*** İdris Gürmez
***Yayın Danışma Kurulu:*** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
***Yayın Türü:*** Haftalık Yaygın Süreli


***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 ***Yenişehir / Diyarbakır***
***Baskı:*** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
**Tel:0 (541) 806 84 85**

# Welatê Antîakos ê zîrek: Komagene

Keştiya Alalû
**Agît Yazar**






Riya qîr, deşt û newalan vediqelêşe; edetî nola marekî reş, lefekên xwe li hev dixîne, çiv û fetlekan li xwe badide; marê reş dixwuşike û dibeze, em jî bi heman lezê li ser pişta wî ne. Li rast û çepên me, zeviyên serridî yên ku nola meriv ew di nav ava zêr de dakiribe, wanî li hêviya dirûna zend û bendên bi xêr û bêrin.

Vê niqlê berê me li cih û warê qralê zîrek, pîrê dîplomasiyê, dahênerê senteza baweriyên ji hev cuda, welatê qral Antîakos, Komagene ye. Di dîrokê de hinek kesayetên welê xurt hene, edetî ji welatekî mezintir in. Çawa Îskender, ji welatê xwe Makedonyayê, mezintir e, qral Antîakos jî ew çend ji Komageneyê mezintir e. Lewra ne bi xêra avakirina tirbên bîrdarî, kîtabeyên li ser erda Mezopotamya yên herî mezin, daçikandina peykerên xwedawendên Yewnan û Med-Persan û her wiha kêlberên bav û kalên xwe, ma ew ê kî ji me bizanibûya ka welatekî bi navê Komagene heye?

Qral Antîakos ê zana û zîrek, ew çend ji ber xwe piştrast bûye, edetî bi yezdanên hingê re ketiye qayişkêşê.

Her ku em nêzîkî erdnîgariya Komageneyê dibin, şahiya min a zarokane di defa sînga min de leqaleqa dibe û nola kela kefa şîr di ser re biqulupe; edetî ez di xwe de hilnayêm. Nexasim çaxa çemê Ferêt, nola gerdeniyeke lacîwertê ezmanî, li ser gerdena Komageneyê dixuyê, hingê coş û kelecana min derdikeve asta herî rajor. Û em di ser pira Nîssîbî re daxilî erda Komageneya şîrîn dibin.

### Stargeha şaristaniyên têkçûyî: Komagene

Çaxa meriv li Mezopotamyaya jorîn a jêrîn û Anatolyayê digere, meriv têderdixîne ku meriv li nav goristaneke dêwasa digere. Erê. Hew xwedê dizane û dîrok dizane bê ka vê erdnîgarê serê çendik û çend şaristaniyan xwariye! Gotineke pêşyan heye, dibêje: ji pezê pirr, maye kavirê kurr! Belê. Piştî Gûtî, Hûrrî, Mîtanî, Ûrartû-Xaltî, Med, Kardak û hinekên din, têkçû. Li dewsa van împerator û dewletên pêşiyên kurdan yên dêwasa, miletekî nola keriyê pez yê ku gur ketibe navê, wanî belawela mabû li naverastê.

Ma hew tenê pêşiyên me têkşikestibûn? Na! Hûn bala xwe bidin edaleta xwedayî; ew şaristaniyên bûbûn sedemên têkçûna pêşiyên me, ew bi xwe jî tevdek têkşikestibûn. Û tew di ser de jî erdnîgara bav û kalên me, ji wan re bûbû stargeha wan.

Ev kî bûn? Ev Sumerrî, Hitîtî û Lowiyên xizmên pêşiyên kurdan bûn. Her wiha Aramî, Asûr û Persên cîranên me bûn. De me li jorê jî got. Edaleta xwedayî tecelî bûbû û xortekî bi navê Îskender radibe. Edetî nola bangêrekî di ser Persên dagirker re derbas dibe. Îskenderê min û we, artêşa Persan a nola xezeba xwedê têkdişkîne, paytexta wan Persepolîs di serê Daryûs de dihedimîne û derbas dibe diçe heta geliyê Îndîsûyê vedigre. Paşê vedigere tê li Babîlê bi cih dibe.

Îskender gelekî dikeve bin bandora şaristaniya Mezopotamyayê û ew dixwaze baweriya zerdeştî û baweriya grekan li nav hev bixîne û baweriyeke nipînû jê derîne. Lê Îskender bêwext dimire û ev daxwaza wî nayê cih.

Piştî mirina Îskender, generalên wî wê îmeratoriya dêwasa li hev parve dikin. Lê her miletek, yan jî her êlateke mezin û bi kok, bi awayekî nîvserbixwe di bin sîwana van împeratoriyan de xwe bi xwe, xwe bi rê ve dibin. Ji van êlatan yek jê êlata Komagene ye. (Divê em vê yekê bibîrbînin ku, Komagene, werisê hukumdariya Kûmûhû ye û ev hikumdariya Kûmûhû B.Z di sedsala 7'an de, li ser dika dîrokê li ber çavan dikeve. Û gelek lêkolîner her wiha dîroknas, qala êlateke Hûrriyan a bi navê Kûmûhû-Komagene dikin)

Her diçû, îmeretoriya Selefkosî lawaz dibû û mîrekiyên di bin sîwana wê de, yeko yeko serxwebûna xwe îlan dikin.

### Serxwebûna Komageneyê

B.Z di sala 163'an de waliyekî bi navê Potalamaes, serxwebûna xwe îlan dike. Paşê, kurê Potalamaes yê bi navê Samos derdikeve li ser textê hukumdariyê û tavilê dest bi reforman dike.

Qral Samos destpêkê tifaqa miletê ji hev cuda û di bin sîwana hikumdariya wî de dijiya, zexm dike. Paşê jî dest bi hilberîna dewlemendiya sererd û binerda welatê xwe dike. Lana hesin dide xebitandin û vêdikeve ji bo artêşên nîzamî, dest bi çêkirina şûr û şilfan dike. Ji hêla din ve aşê zeytê çêdike û bi qasî îxrac bike, zeytê difroşe welatên din ên cîran. A herî girîng jî şerabeke bi marqa Monarît dihilberîne. Di wê demê de, bi navê marqekê hilberîna xwarin-vexwarinê, tiştekî kesnedîtî bûye. Li hêla din qral Samos paytexta xwe Samosata zexm dike û ticareta di ser çemê Ferêt re bi pêş dixîne.

Qral Samos di warê dîplomasiyê de jî culhetkar tevdigere û dotmîra qralê Selefkos a bi navê Laodîkya ji kurê xwe Mîtradates Kalînîkos re dixwaze (di vir de em dibînin navê xwedawendê rojê, Mîtra li kurrê xwe kiriye). Bi xêra vê zewacê, dewleta Komagene nola 'werma mar' bi pêş dikeve.

Ji zewaca Mîtradates Kalînîkos û Laodîkya lawek çêdibe. Navê kalikê wî Antîakos ê bavê Laodîkya li wî lawî dike û navê wî jî datîne Antîakos.

Antîakosê zîrek, nola berxê li du makan bimije, wanî mezin dibe. Ji hêla bavê ve, ji binemaleke biesil e û ji hêla dê ve jî xwe digihîne Selefokosên ku xwe ji malbata Îskender dihesiband. Antîakos bi vî awayî, ji ber xwe piştrast mezin dibe.

Bi vê bîr û baweriyê Antîakos B.Z di salê 69'an de derdikeve ser text û xwe wekî dostê Romayê îlan dike (Lewra generalê romayî yê bi navê Lucullus, gelekî li pîbarê Komageneyê û her wiha hevnijada wê Kurduene rabûye û gefa Tîgranê ermen ji ser çavê wan rakiriye). Di vê hênê de, împeretoriya Romayê hînê nû serhildana Spartakûs tepiser kiriye û hukumdarê romayî yê nola roviyekî kone, Pompey derdikeve sefera rojhilat.

Pompey tê bi Antîakosê zîrek re dicive û bê berdêl bajarê Zeûgmaya gelkî stratejîk û dewlemend, bi ser erda Komageneyê ve berdide.

Piştî qral Antîakos dostaniya xwe bi Romayê re xurt dike û şûnve, vêca mervantiya zewacê bi hikumdariya Partan re datîne. Bi vî awayî dîplomasiyeke bêhempa dimeşîne û herdu hikumdariyên dêwasa, dixesîne.

Piştî meşandina dîplomasiyek ev çend culhetdar û biaqilane, Antîakos êdî bajarên muhteşem ava dike û xwedawendên hingê vedihewîne li ser erda bixêr û bêr a Komageneyê û wan li hev dicivîne. Edetî mîsyona navbênkariyê dimeşîne. Bi vê mebestê, Antîakos dixwaze miraz û mexseda xalê xwe Îskenderê Mezin bînê cih û cîhana rojhilat û rojava li dora vê baweriya nîpînû bicivîne.

*

Serê sibê zû em li mala dostê hêja, Mustefa yê rojnameger xwurêniya xwe dikin. Paşê em li gel nivîskar û lêkolîner Mehmet Oncu ji Semsûrê derdikevin û em berê xwe didin havîngeha Komageneyê, Arsemiya a bi destên hostayên komageneyî hatibû evakirin.

Li Arsemiyayê, qral Antîakos me pêşwazî dike. Em dinêrin beriya me mêvanekî wî yê din jî heye. Antîakos, bi destê xwedawendê hêzdar Herakles ê bi hêbet girtiye. Ez jî diçim destê xwe dirêjî destê wam herduyan dikim...

***(Didome)***





